


Piştî 75 salan di navbera kurdan û dewleta tirk de


# Li Lozanê şerê dîplomatîk

Peymana Lozanê ku îro di çav dewleta tirk de bûye mîna tabûyekê, bi navneteweyîbûna kêşeya kurd re, rewabûna xwe winda dike û dibe mijara nîqaşan. Rayedarên tirk xwest ku piştî 75 salan, morkirina vê peymanê li bajarê Lozanê pîroz bikin, lê nekarîn destûrê ji dewleta Swîsreyê bistînin. Li hemberî vê yekê kurd di 24-25'ê tîrmehê de vê peymanê bi meşekê protesto dikin û rewabûna wê bi konferansekê gengeşiyê re vedikin.

R. 3



Şemsettin Kurt di 2'yê tîrmeha 1993'yan de li ber Balyozxaneya Bernê ya tirkan hate kuştin.



Şahidê dîroka nêzîk ya kurdan İsmet Şerîf Wanly:

## Qewimînên dawîn gelekî hêja ne

İsmet Şerif Wanly, dîroka nêzîk ya Kurdistanê bi çavê serê xwe dîtîye. Ew berê ji bo kurdên Bakur reşbîn bûye lê rûdanên gelekî hêja dibîne. Wanly stratejiya PKK'ê wekî hêviya xwe diyar dike û bi vî awayî diaxive: "Mele Mistefa digot: 'Otonomî ji bo Kurdistanê, demokrasî ji bo gelê ereb'. Lê PKK dibêje, em millet in, heqê me hene. Belê îmkanên me tune ne lê stratejiyeke me heye."

Wanly, her çiqas ku ji bo Mele Mistefa rêzgirtina xwe radigihîne jî lê helwesta PDK'ê ya îro wekî "helwesteke xerab" bi nav dike. Rexneyên Wanly ên li ser rewşên kurd jî balkêş in.

R 8-9

elîm Yûsiv: Mêrek pala xwe dide avê - Rûpel 10

ûçe-Nirxandin: Komkujiya Serdeştê... - Rûpel 4

ranîn: Şêra Şemrex Emine Akkuzu - Rûpel 6

anoger Lakîs: Hunerê bi mirovatîyê re dest pê kiriye - Rûpel 16

Osman Özçelik: Tu bi xêr hatî Vedat Türkali rpl.5


Mîrhem Yîgî: Jiyana ciwanên kurd li Swêdê rpl.7

Hasan Kaya: Evîn behr e rpl.13

Bekîr Şivanî: Raportî koç rpl.7



## Azadiya WELAT



SAMÍ TAN

## Girîngiya têkiliyên navneteweyî

Tevgera Azadiyê, bi geşbûna xwe re kes û saziyên ku xwe di nava vê tevgerê de dibînin, dixê bin berpirsiyên nû. Tevger di her warî de rêxistinîbûn û tîkûzbûnê dide pêş. Bo nimûne, di warê diplomatîk de gavên mezin tî avêtin. Êdî giraniya nûnerên saziyên neteweyî digihêje asta rayedarên dewletan. Nûnerên saziyên neteweyî li welatên cur bi cur mîna rayedarên dewletan tî pêşwazîkirin.

Lê mirov nikare bibêje ku, îro hemû kes û saziyên me xwe li gorî pêdiviya qonaxê bi rêxistinî kirine. Di vî warî kes û saziyên herî dûrî pêdiviyên qonaxê yê li metropolên tirkî in.

Sedemên vê yekê gelek in. Hinek ji wan girêdayî helwesta dagirkeran in. Ew, rê li ber xurtbûna saziyên neteweyî digirin, nahêlin ku gelek gavên pêwîst bî avêtin. Her wiha li ber tîkîldanîna bi derve re jî dibin asteng.

Di vî warî de helwesta rayedarên hinek dewletên ewrûpî jî balkêş e; ew jî hemû kurdên ku ji bo vîzeyê serî li wan

didin, wekî qaçax û penaber dibînin. Naxwazî tî bigihêjin ku, xebatkar û berpirsên saziyan ne jî bêgavîyê, lê li ser daxwaza xwe li vir dimînin. Heta piçek jî derfeta xebatê hebe, dev ji war û karê xwe bernadin. Heke herdin jî dê berê pîraniya wan ne li Ewropayê, lê li Welêt be.

Ne diwar e ku mirov helwesta rayedarên dewletên ewrûpî û dagirkeran fêm bike. Dewletên împeryalîst li ser keda çînên bindest û gelên bindest dewlemendiyek afirandine, naxwazî vî dewlemendiyê bi kesî re parve bikin. Hêzên dagirker jî dixwazî Tevgera Kurd ji binî ve ji holê rakin. Lewre jî naxwazî tîkîliyên saziyên neteweyî û kesên welatparêz bi cihanê re gurtir bibin.

Tîştê ku tî gihîştina wê diwar e, helwest û nêzîktêdayîna me bi xwe ye. Çima di warê tîkîliyên navneteweyî de em ev qas li paş in? Dema heyetek jî derve tî, rêxistineke me ya ku bi wan re eleqedar bibe nî e û di pêdekirina wergêran de em zahmetiyê dikişînin?

Em bawer in di vî warî de astenga herî mezin, di warê perspektîfê de ye. Em bi çavên ku dinya li me dinîhêre li xwe nanîhêrin. Ji vî zêdetir, em bi çavên rayedarên dewleta mêtînger li xwe dinîhêrin. Dagirker, saziyên kurdan wekî saziyên rasteqînî nabînin. Rojnamegerên me bi çavên rojnamegerên "sekte" tîne dîtin. Hunermendên me wekî hunermend nayên napejirandin. Siyasetmedarên me biçûk tîne dîtin. Tîştê herî xerab jî, ev e ku em jî di bin bandora vî bîrdora dijîmin de dimînin, xwe wekî rojnameger, hunermend û siyasetmedarên resen nabînin û li gorî vî yekê xebatê nakin.

Lê gelekî zelal û diwar e ku, dagirker derewan dikin. Lewre dewleta ku, sazî û mirovên me biçûk dibîne, binbêjîngên tevgerê dide ser serê xwe, wan wekî rojnameger, hunermend û siyasetmedar û rewşenbîrên herî mezin pêşkêş dîke.

Ji bo ku di her warî de gavên li dûv qonaxê bî avêtin, pêdivî bi guherîna vî niherî û nêzîktêdayîna heye.

Em bi çavê ku dinya li me dinîhêre ne, bi çav ku mêtînger li me dinîhêre, li xwe dinîhêrin. Lewre jî em nikarin di warê tîkîliyên navneteweyî de gavên pêwîst bavêjin.

# Tu kes nikare bi çeka evîna dozê

## Ferhengok

**awarte:** îstîsna, aykîrî  
**bahor:** meltem  
**belam:** lê, lê belê  
**berbezi:** musabeqe  
**berfedîn:** birên berfê yê ku dihelin  
**bertîzur:** rûşwetxur  
**bestenî:** dondurma  
**bestin:** girêdan  
**betlane:** tatîl  
**bêdad:** bê-adalet  
**binbirkirin:** kok qelandin  
**cemawer:** girse (kitle)  
**çarenûs:** qeder  
**dab û nêrit:** orf û adet  
**dîyarde:** kirû (olgu)  
**êsta:** niha, nika  
**fêrkirin:** hînkirin, eli-mandin  
**fêz:** mexelê demdemî  
**fîrawan:** fireh  
**gewre:** mezin  
**hevsing:** xafika kewan  
**keşk:** tarhana  
**kula pîroz:** cureyekî kunêr

**kutahî:** dawî, paşî  
**lêguncîn:** lêhatin  
**lêtuşîhatin:** lêrasthatin  
**nemaze:** bi taybetî nîfs  
**nîfs:** nesîl  
**niqijîn:** ikinmak  
**palûte:** zibare (imece)  
**pesendkirin:** erêkirin (onaylama)  
**qiriktalî:** dilojarî  
**rêgeh:** guzergah  
**sîrim:** tayên ji post  
**stewîn:** perisîn, kemilîn  
**şaneşîn:** balkon  
**şarî:** bêjînga tîlînî  
**terxankirin:** ji tîştêkî re veqetandin  
**tomarkirin:** qeydkirin  
**vederkirin:** surgûnkirin  
**vehatin:** hilhatin; pêketin  
**vepîmixîn:** veciniqîn  
**zanyarî:** agahî, ilmî  
**zor:** gelek, pir

### REMEZANÊ HÛRÎ/ ÎZMÎR

Di dîroka mirovahiye de gelek şer û ceng çêbûne, gelek mirov hatine kuştin, qirkirin talankirin û koçberkirin, heta gelin ji wan bi tevahî ji holê rabûne, hinek ji wan bi hejmareke pir hindik mane.

Di van şeran de gelek navgîn û çekên cur bi cur hatine bikaranîn, aliyek şer dike ku bikuje, aliyek jî şer dike ku bijî. Armanç tîştê tenê bû. Serdestan dixwest serdestiya xwe bidomîne, bindestan jî dixwest azad bijîn.

Vêga di roja me de çekên pir modern û bi teknolojîyê bilind derketine ku dikarin bi milyonan mirovan qir bikin, bajaran ji binî ve wêran bikin, dar û daristanan bişewitînin, kevir û çîyan hilweşînin; lê, çekek heye ku ji van çekan he-

mûyan diwartir û mezintir e. Ev çek tenê di destê gelên feqîr û bindest de heye. Ev çek, çeka baweriyê ye, bi vî çekê gelên bindest li dijî wan çekên serdestan şer dikin û di dawiyê de bi ser jî dikevin. Ma li Vî-etnamê, ma li Angolayê, ma li

**Vêga di roja me de çekên pir modern û bi teknolojîyê bilind derketine ku dikarin bi milyonan mirovan qir bikin lê, çekek heye ku ji van çekan hemûyan diwartir û mezintir e. Ev çek, çeka baweriyê ye.**

Cezayirê ne bi vî çekê bi serketin û dagirker ji welatên xwe qewirandin?

Îro li Kurdistanê jî gelê kurd rahiştiye vî çekê û pê li dijî artêşa tirk a dagirker şer dike. Îro bi deh hezaran keç û xortên kurd di hembêza çîyayên welêt de şer dikin.

Îro bi sedan berxwedêrên

zindanan di greva birçîbûnê de berxwedana xwe dikin. Bi wê vî û baweriyê ji pola canê xwe didin ber mirinê, her roj piçekî ji canê xwe didin, hetanî bi mirinê bi qerar û biryardar in. Vê hêz û qewetê ji çeka bîr û baweriyê bi dozê distînin. Hemû çekên li dinê li hev û din bicivin jî nikarin vî çekê bişkînin, nikarin wê ji holê rakin. Ji ber ku ev çek çeka hezkirina welat e. Çeka eşq û evîna dozê ye; çeka girêdana bi rêça azadiyê ve ye; çeka xelasiya gel e; çeka paqijkirina qirêj û gemara hezar salan e.

Îro bi laşekî tazî lê bi baweriyê ji pola ku tu car nayê şikandin û tewandin berxwedêrên zindanan li dijî hemû zordarî û hovitiya dewleta tirk di-sekinin, singên xwe li ber derbên dijîmin dikine mertal. Serkeftin ji gelê kurd re ye ji berxwedanên zindana re ye "Berxwedan jîyan e".



# Piştî 75 salan di navbera kurdan û dewleta tirk de Li Lozanê şerê dîplomatîk

Dewleta tirk ji bo betalkirina konferansa kurdan a li ser Peymana Lozanê, bi faşîstên tirk name û faksên protestoyî ji rayedarên Swîsreyê dide hinartin. Amadekarên konferansa kurdan didin zanîn ku, ew ê van çalakiyên kirêt ên fasîştan bi avê de bibin.

Di pirtûkên dîrokî yên tirkan de wiha dihat gotin: "Serkeftina Şerê Rizgariyê di 24'ê tîrmeha 1923'yan de li bajarê Lozanê yê Swîsreyê bi têkbirina 7 dewletan hate peyitandin."

Li hemberî Çiyayên Alpê, Gola Lemanê ku bajarê Evian ê Fransayê û Swîsreyê ji hev vediqetîne, heye. Li keviya vê golê, serbajarê kantona Vaud Lozan cih digire. Li vî bajarê ku serjimara wê 120 hezar e, berî niha bi 75 salan peyman ku dawî li Şerê Yekemîn ê Cihanê anî, hate girêdan.

Ev peyman ji bo gelê bindest ên mîna kurd, ermen û rûman xwediyê wateyê cuda bû. Ji ber vê yekê nivîskarê ermenî Gaspar Armand wê demê li ser vê peymanê pirtûkek nivîsî û navê pirtûka xwe kir "24'ê Tîrmehê Roja Navdarî û Şînê."

## "Peymana Lozanê çewtiyek bû"

Îro jî ev peyman ji bo hinekan cejn, ji bo van gelan bi taybetî jî gelê kurd, roja protesto û niqaşkirinê ve peymanê ye. Îsal rayedarên Tirkîyeyê ji bo pîrozkirina girêdana ve peymanê, serî li rayedarên Swîsreyê dan. Serbalyozê Bernê yê Tirkîyeyê Taner Baytok bi gotinên wekî "Hemû beşdarên ve peymanê çûn ser dilovaniya xwe, bi tenê bajarê Lozanê wekî şahidê peymanê li holê ye. Divê hemû Swîsreyî bi vê yekê serbilind bibin.", serî li rayedarên Swîsreyê dan. Lê li vî welatî 30 hezar kurd dijîn û pîraniya wan jî di warê siyasî de çalak in. Lewre jî li vî welatî karîger in. Hikûmeta Swîsreyê û hikûmeta kantonê daxwaza rayedarên Tirkîyeyê bi hinceta "Qesra ku lê peyman hatiye girêdan Palais de Rumine di nava xwe de çar muzexaneyan dihewîne, berhemên hunerî û dîrokî yên di hundir de, ji ber reaksiyona aliyê din (kurdan) dikare zirarê bibîne" red kir. Di redkirina ve daxwazê de sedema bingehîn çalakiyên kurdan in. Si hezar kurdên li vî welatî bandor li gel û dewleta Swîsreyê kirine. Çalakiyên kurdan nihêrîn û nêzîktêdayîna rayedarên Swîsreyê ya li ser peymanê jî guhartiye. Ev rastî di daxuyaniyên rayedarên û nivîsên di çapemeniya vî welatî de jî diyar dibe.

Çapemeniya vî welatî û Fransayê ku wê demê ev peyman wekî "Aştiya Loza-

nê" û "Kutabûna Şerê Cihanê" bi nav dikir, îro bi şik û guman li vê peymanê dinihêrin. Yek ji mezintirîn rojnameyên Swîsreyê "24 Heures", roja 7 tîrmeha 1998'an sernavê "Şerê Lozanê" bi kar anî. Di nava nûçeyê de ev tişt dihatin gotin: "Dewleta tirk dixwest xewn û xeyalên xwe vejîne. Wezîrê Karê Derve yê Tirkîyeyê dixwest bikeve milê Wezîrê


nameya 24 Heures ev gotin li xwediyê wan vegeandin. Digel siyasetmedarên Swîsreyê, gelê vî welatî jî ji kêşeya kurd haydar e. Lewre li vî welatî ku nifûsa wî 7 milyon e, 3 milyon rojname tîn firotin. Kêşeya kurd di sala 1993'yan di rojeya Swîsreyê de bi berfirehî cih girtibû. Roja 2'yê tîrmeha 1993'yan kurdên li vî welatî, li ber balyozxaneya tirkan xwepêşdana li dar xistibûn. Dîplomatên tirk girse gulebaran kiribû û di vî bûyerê welatparêzê bi navê Şemsettin Kurt hatibû kuştin. Li gorî agahiyan, berik ku Şemsettin Kurt pê hatibû kuştin, ji çeka Serbalyozê wê demê Kaya Toperi derketibû. Ev bûyer di navbera dewleta tirk û Swîsreyê de bûbû sedema qeyraneke siyasî.

## Meş û konferansa kurdan

Şerê dîplomatîk ê kurdan û dewleta tirk bi pîrozbahiyên dewleta tirk ne sînorkirî ne. Kurd jî dixwazin îsal ve peymanê bi konferanseke hiqûqî ji gengeşeyê re vekin û balê bikişînin ser encamên neyinî yên ve peymanê ku tirk wekî tabû dibînin. Yekîtiya Hiqûqnasên Kurdistanê, dê roja 24'ê tîrmehê konferanseke li dar bixe. Bi pey agahiyan, 9 parlementerên Swîsreyê jî, dê beşdarî ve konferansê bibin. Roja duyemîn jî dê Kurdistanî meşekê jî li dar bixin. Ev meş dê ji Montbenonê dest pê bike û heta Chateau d'Ocay ê 1.5 km. bikişîne. Dewleta tirk li aliyekî hewl dide ku destûra pîrozbahiyên bistîne, li aliyê din jî dixwaze rê li ber çalakiyên kurdan bigire. Ji bo gihîştina doza xwe jî, rêbazên wekî bertil, xûgî û şantajê bi hev re dimeşîne. Serbalyozê Tirkîyeyê yê Bernê Taner Baytok di daxuyaniyê xwe de ev nirxandina balkêş kir "Li Tirkîyeyê 20 milyon kurd hene û yek ji wan jî PKK'ê nas nake." Ew bi van gotinên xwe di nav raya giştî de bû mijara henek û pêkeniyan.

Dewleta tirk ji bo betalkirina konferansa kurdan, bi faşîstên tirk name û faksên protestoyê ji rayedarên Swîsreyê dide hinartin. Li hemberî ve yekê, rewşenbîr û siyasetmedarên kurd jî xebatên xwe yên dîplomatîk gur kirine. Amadekarên konferansa kurdan didin zanîn ku, ew ê van çalakiyên kirêt yên fasîştan bi avê de bibin.

A. WELAT/ LOZAN



Chateau d'Ouchy (Qesra Oşî): Cihê ku Peymana Lozanê lê hatiye morkirin.

Karê Derve yê me û li ser xalîçeyên sor bimeşin û derkevin pêşberî vexwendiyên ji welatên cur bi cur. Xewna netewepe-restê tirk Taner Baytok ev bû." Serokê Belediyeya Lozanê yê berê Yvette Maggi ku ji partiyeke sosyalîst e bi awayekî vekirî got: "Peymana Lozanê çewtiyek bû." Her wiha Serokê Belediyeya Lozanê J. Jaques Schilt jî ev nirxandin kir: "Ev peyman ku ji bo tirkan tê wateya avabûna Tirkîyeyê, bi xwe re kêşeya kurd derxistiye holê. Ew kêşeyê wisa ye ku, heta îro jî nehatiye çareserkin." Li hemberî ve helwestê, rojnameyên tirk li dijî J. Jaques Schilt kampanya dane destpêkirin. Rojnameya Hürriyetê hemû pîvanên rojnamegeriyê dan alî û bi sernavê wekî "Çirkin Başkan (Serokê Kirêt)" êrişî wî kir. Li hemberî ve yekê, çapemeniya Swîsreyê jî bêdeng nema, roj-

## Dik

## HIKÛMET, KARMEND Û GIRTÎ

Di sala 1996'an de li Ūrdinê dema Hikûmetê buhayê nêzîkê kiribû gel serî hildabû. Hikûmet mecbûr mabû ku biryara xwe bi paş ve bikişîne. Li Tirkîyeyê her roj buhayê her tiştî zêde dibe, lê tu deng nîn e. Mehmiza karmendan kêm dibe, dîsa reaksiyoneke tûj nayê nîşandayîn. KESK'ê berî niha bi demeke kurt jî, yanî beriya kongreya xwe biryarên baş digirtin. Lê piştî kongreyê ji tevgerîn û daxuyaniyên wê diyar dibe ku gava xwe bi paş ve avêtîye. Endamên KESK'ê bi xwe jî ve yekê bi tundî rexne dikin. Tê gotin ku ji ber vê polîtîkayê ew dê hemû endamên xwe yên welatparêz û demokrat ji dest bide. Vê hefteyê KESK'ê li gelek cihên Stenbolê çalakiyên protestoyî li dar xistin, lê tu encameke baş bi dest nexist. Serokwezîr Mesut Yılmaz ji ser a xwe nehate xwarê û li mehmiza karmendan % 20'î qurîşek zêde nekir. Di heman rojê de li Taksîmê ji karmendên girêdayî sendikaya BEM-BIR-SEN'ê çalakiyek li dar xist. Li gel tûjtirîn kemalîstbûna xwe jî, ji KESK'ê bêhtir sloganên watedar diavêtin. Wan ji bo ku ve biryara hikûmetê protesto bikin porê karmendan qusandin.

Piştî van çalakiyan bi rojekê li Parka Barbaros a Beşiktaşê sazî û komele û kovarên jinan bi hev re derbarê greva birçûbûnê ya li girtîgehên Sêwaz, Erzirom, Kırklareli, Elbistan û Maraşê de daxuyaniyê çapemeniyê dan. Di daxuyaniyê de çewsandinên li dijî girtîgehên hatin şermazkirin û hate diyarkirin ku ew dê ji her tiştî Wezîrê Dadê berpîrs bigirin. Beriya ku daxuyaniya çapemeniyê bê dayîn nêzîktêdayîna jinên ÖDP'yî balkêş bû. Jinên ÖDP'yî jî bo ku polis eleqeya xwe ji wan neyînin, xwe bi wan şêrî dikirin. Vê yekê jî ji henekên wan xwe dida der. Heta di wê neqebê de polîsekî ku bi wan re radibû û rûdînişt der barê çalakiyê de rapor da komserê xwe. Di dema rapordayînê de ji bo ku ew jî xwe bi wan ÖDP'yîyan şêrî bide nîşandayîn bi dengê bilind di bêtêlê de wiha got: "Komserim 300'e yakin eylemci birikti, harekete geçiyoruz!", pîre pîre hemû ekîbên polîsan ên li wê derê nêzî meydanê bûn. Lê piştî ku wî ji komserê xwe re got ku min henek kir, ew ekîp bi paş ve vekîşiya. Piştî ve yekê jî kîfa ÖDP'yîyan kirin ku xwe çeng bikin hem-bêza polîsan. Ev nêzîktêdayîna ÖDP'ê ji mitînga Sultanahmedê heta niha wisa didome.

AZAD ALTUN



# Komkujiya Serdeştê 11 salan hate veşartin

**D**i dema şerê Iraq û Iranê de gelek ji gund û bajarên Kurdistanê bi çekên kîmyewî û biyolojik hatibûn bombebaran kirin.

Di salên 1980-88'an de, beşek ji îdiayên wisa belav bûbûn. Lê ji ber zilma li ser gelê kurd û beşek bertilxur û xwefiroşên kurdan, zanyariyên berfireh bi wênayên komkujiyê û dokûmantên zindî dereng derketin holê, ku li rojhilatê Kurdistanê li bajarê Serdeştê ji komkujiyek mîna Helebçeyê çêbûye.

## Bûyer çawa çêbû?

Roja 7'ê pûşpera 1987'an hêzên Iraqê li gorî plana xwe dixwazin êrişê bibin ser navendên leşkerî yên Iranê li bajarê Serdeştê. Balafirên bi bombeyê kîmyewî barkirî ten ser bajêr û ber bi nîvroki bajarê bombebaran kirin. Bombebaran demêke kin didome, lê di wê dema kin de ji 700 kes dimirin, 6000 kes jî birîndar dibin. Her wiha hejmareke mezin ji niştecihên bajêr bar dikan.

Şahidên bûyerê teolog Dr. Huseyin Xaliqî, lêkolîner Saîd Mehmedî, helbestvan Alan Rûbar bi boneya salvegera bûyerê li Înstîtuya Kurdî ya Stockholmê pirsên me bersivandin. Xaliqî wisa got: "Ez wê rojê diçûm bajêr. Dema ez nêzikî bajêr bûm, bêhneke tûj hate pozê min. Paşê çîreqîra xelkê hate guhê min û birîndarên ku dibirin nexweşxaneyên Ormiye û Tewrêzê derbas dibûn."

Rûbar Alan bi şeweyekî din nêzi bûyerê bû: "Ev plan beşek ji projeyên komkujiya kurdan bû. Beşek ji gelê bajêr xwe dabû alî. Lewma ye ku hejmara kuştîyan bi 700'î sinorkirî man. Bi hezaran kes birîndar bûn û malên xelkê hilweşîyan. Hewlêdanên dagirkeran piralî çêbûbûn ku zaniyarî li ser komkujiyên li cihanê belav nebin. Ew sîncdar in, lê gunehkarên herî mezin beşek ji kurdên xwefiroş in ku bi bertilan rêlêgirtin ku zaniyarî belav bibin. Wan çavên xwe ji komkujiyê re girtibûn."

Li aliyê din şahidê bûyerê Mehmedî ji awira stratejîk û dîroki ve nêzi pirsê bû: "Cihê Serdeştê ji awira stratejîk ve xwedî cihekî girîng e. Li ser sinorê başûr û rojhilatê Kurdistanê ye. Her dem alîkarî daye rêxistinên neteweyî yên her du aliyên welêt. Zerdeşt Pêxember xebatên xwe li vir xurt kiribûn. Lewma ye ku Zerdeşt bûbû hedefa dagirkeran."

Înstîtuya Navneteweyî ji bo Lêkolîn û Aştiyê (SIRPÎ) di rapora xwe ya 1990'î de rastiya bûyerê dipejirîne û wisa berdewam dike: "Çekên kîmyewî di şerê Iran û Iraqê de hatibû bi karanîna û cihên kurdan



Wêne: Ji pirtûka Ramazan Öztürk 'Sessiz Tanık'



ji hatibû bombebaran kirin." Li gorî şahidên bûyerê, çekên ku hatibûn bikaranîn ji Almanya û Hindistanê hatibûn. Pierre Salinger û Eric Laurentê ku nêzi Qersa Spî li Amerîkayê ne, di xebata xwe ya "Dosya Girtî ya Kendavê" de wê yekê dipejirînin û qala 86 şirketên almanî ku çekên kîmyewî firotine Iraqê dikin.

Li gorî îdiaya kovara Sorunêr (a rezbera 1988'an) çekên kîmyewî bi alîkariya şirketên tirkî "Penta" û "Onak"ê ji Mîrsînê hatine barkirin û ji wir çûne Iraqê. Înstîtuya Kurdî li Stockholmê diyar kir ku difikirin bûyerê bi riya Yekîtiya Hiqûqnasên Kurdistanê bibin dadgehên navneteweyî.

GABAR ÇIYAN

Di salên 1980-88'an de, qala komkujiyê li Serdeştê dihate kirin. Lê ji ber zilma li ser gelê kurd û beşek bertilxur û xwefiroşên kurdan, zanyariyên berfireh bi wênayên komkujiyê û dokûmantên zindî dereng derketin holê. Înstîtuya Navneteweyî ji bo Lêkolîn û Aştiyê (SIRPÎ) di rapora xwe ya 1990'î de rastiya bûyerê dipejirîne û wisa berdewam dike: "Çekên kîmyewî di şerê Iran û Iraqê de hatibû bi karanîna û cihên kurdan ji hatibû bombebaran kirin."



# Rêzimanê kurmancî

## - Wane 20 -

SAMÎ BERBANG

### Daçek

Ev beşa hevokê bi serê xwe ne xwe-diyê tu wateyê ye. Lê di nava hevokê de beşên din ên peyvê sergihayî dike. An jî wan bi wate dike, wateya wan xurtir dike, wateya xwe jî li wir dide der. Her wisa jî rista xwe diyar dike. Daçek, her wekî çawa dikarin bi serê xwe di nava hevokê de cih bigirin, dikarin digel hoker, rengdêr, cînavk û lêkeran jî bîn û daçekên nû pêk bînin. **Di kurmancî de daçekên bingehîn ev in: Bi, bê, ji, li û di ne, yên din jî bi alîkariya wan pêk hatine. Li vê derê danîna nîşeyêke rastnivîsê pêwîst e, ew daçek û paşdaçekên wan tu car bi peyveke din ve nabin, divê serbixwe bîn nivîsandin. Piştî vê nîşeyê em dikarin derbasî rêzkirina daçekan bibin.**

### Cureyên daçekan

**Daçekên serbixwe:** Li, bi, ji, di, digel û hwd.

**Mînak:**

*Evin bi balafirê diçe mala apê xwe. Serdar li wir namîne, dê here malê. Sinemxan ji bajêr tê. Bozo kevirê di diz wer kir. Heke tu digel min werî, ez ê kêfxweş*

*bibim.*

Hinek daçekên bingehîn ku li jor navê wan derbas bû, bi şêweyekî din jî derdikevin pêşberî mirov. Ev daçek hevedudanî ne û ji pêşdaçek û paşdaçekan pêk tên, bo nimûne:

*Bi... re (Tu bi min re hatî mal)  
Bi... ve (Elî bi wir ve çû.)  
Bi... de (Xanî bi ser de ket.)*

*Ji... re (Zozanê ji Elî re tu tişt ne-got.)*

*Ji... ve (Xanî ji binî ve hilweşiya, êdî bi kêrî tişteki nayê.)*

*Ji... de ( Ji aliyê min de qewimî)*

*Di... re (Ev karê xwe di binî re di meşîne.)*

*Di... ve (Di paş ve êriş bir ser hevalan)*

*Di... de ( Kesên wekî wî di cihê xwe de nasekinin.)*

**Daçekên neyîniyê:** Ne û bê, bêyî Tu ne ew mêrî, lê ez çî bikim hinekên din li pişt te hene.

*Ez bê te naçim tu deran.*

*Bêyî te ew kar nameşe.*

**Daçekên sedemî** yên wekî ji bo, seba, lewre, ji ber û lewma...

*Ji bo te ew karekî gelekî hêsan e.*

*Ew seba wî karî hatibû, lê we nehişt*

*ku ew karê xwe bibe serî.*

*Ji ber dexesiya hinekan, karê min nîvco ma.*

*Tu nehatî ji lew re ez jî neçûm.*

*Tu naxwazî lewma ez nakim.*

**Daçekên dubare** yên mîna hem ... hem jî, ne... ne jî û hwd.

**Hem** tu nehatî, **hem** jî te nehişt ku xwişka te were.

**Ne** Elî nan xwar, **ne** jî Zozanê.

### Daçekên pêkhatî

Daçekên bingehîn dema tîn ber navdêr, hoker û cînavkekê wê jî bi xwe re dikin daçek. Bo nimûne: Li pêş, li paş, li ser, li jor, li jêr, li nik, li bin, di ser de, di bin de, di nav de, ji bin ve, di bin re, di ser re, ji min, li min, di ber re, di ber de, di wir de, ji bilî, bi pişt re, di dûv re, li hember, li dij û hwd.

*Li pêş te kes tune ye, lewre jî hay ji xwe hebe.*

*Li paş diwêr nesekine, dibe ku diwar hilweşe.*

*Dijmin daran ji binî ve qut dike, da ku careke din şîn nebin.*

*Di ber mala me re derbas nebe.*

*Ji bilî te kes wî nas nake.*

*Li hemberî vê gotina te, ez nizanîm çî bibêjim?*

*Li ser darê kes tune ye.*

*Giha li bin kevir hêşîn nabe.*

*Agahiyên di ser re bi kêrî me nayên.*

*Wi li wî xist.*

*Di navberê de maye, nizane bi ku de biçê.*

*Li dijî vê dozê kes nikare raweste.*

### Daçek peyvên guherbar dite-wîne

Taybetiyeke daçekan ev e ku, peyvên piştî xwe ditewînin. Peyva guherbar di kîjan demê de dibe ew zane, ger li pey daçêke bingehîn bê, ditewe. Bo nimûne, gava em bibêjin: "Zozanê Zîn dit." Di vê hevokê de "Zozan" kirde, "Zîn" bireser e û ji ber ku bûyer di dema borî de qewimiye, kirde (Zozan) tewiyaye, bireser (Zîn) wekî xwe maye. Lê dema em daçêkekê bînin ber bireserê, dê wê jî bi xwe re ditewîne. Ji bo zelalkirina vê mijarê mirov dikare hevoka "Zozanê li Zînê nihêrî." bide, di vê hevokê de jî "Zozan" kirde û "Zîn" bireser e, lê ji ber egera ku me li jor daxuyakirin, "Zîn" jî tewiyaye bûye "Zînê". Çend mînakên li ser heman mijarê.

*Hevala min ji wî re got.*

*Gundiyan li Bozên dan.*

*Kes li Robêr (Robarî) nanihêre.*

*Di dibistanê de mamoste tune.*

*Li malê xwarin nema.*

*Ji Bêrivanê re tişteki nabêje.*

*Bizîne tîne li bajêr difiroşe.*

*Aş bi avê bi gerê dikeve.*

## Tu bi xêr hatî Vedat Türkali

OSMAN ÖZÇELİK



**V**edat Türkali û Prof. Dr. Server Tanilli bi hevûdu re, li ser pîrsgirêka kurd, belavokêke dinivîsin û di 21'ê pûşpera 1992'an de, di kovara "2000'e Doğru" de bi heq (bi pereyan) diweşînin.

Nivîskar, dixwazin ev belavok di rojnameyên rojane de jî (Sabah, Milliyet, Hürriyet, Cumhuriyet) wekî îlanêke bi heq bê weşandin. Belê, tu rojname îlanê qebûl nakin.

Vedat Türkali komûnîstekî kevn, roman-nivîsekî bi nav û deng ê çepgir e. Rojnameya çepgir (!) "Cumhuriyet" jî li ser piştî çepgir jiyana xwe didomîne.

V. Türkali, bi hêvî û bawer e ku, wê Cumhuriyet, ji wan re piçekî îskontoyê jî bike. Rayedarê Cumhuriyetê yê çepgir (!) di telefonê de di ser wan de diqîre: "Mebûs, Mebûse e! Mebûsê kurd çî ye?... Mamoste, mamoste ye, mamosteyê kurd tê çî wateyê? Ma hûn dixwazin çî bikin!.."

Ev bûyer V. Türkali şoke dike, ji wê rojê pê ve bi çavekî rexnegirî li çepgirê xwe û li

xwe dinihêre û dest bi rexneyan dike, li xwe û li wan.

Vedat Türkali ji Atilla Tokatlı bihistiye, wisa vedibêje: "Demekê di nav mir û begên Fransayê de nêçîrvanî bûye mode. Nêçîrvanî û esalet bûne yek. Nêçîrvanî xweş e lê ne hêsan e. Her kes ne segman (nîşandar) e ku, bi yek derbê nêçîrê ji jor de bîne xwarê, vala avêtin jî hewesa mirovan dişkîne, mirov şerpeze dibe. Ji began hinek beg çareyekê dibînin. Dema li daristanê hêj çûk di hêkê de û hêk di hêlînê de ne, li ser qadek fireh a daristanê, li serbanê daran torek mezin vedigirin. Çûkên hêka xwe dişkinin û dest bi ceribandînen firîne dikin, dikarin heta tora vegirtî bi hewa bikevin, li torê dikevin û tîn xwarê. Bilindfirîna wan heta torê ye.

Çûkên bi vî awayî hîn firîne bûne, piştî tor ji ser daristanê radibe jî, nema dizanin bilind bifirin. Gava dem û demsala nêçîrê tê, begên nêçîrvan ên mizawir, tûrikên wan bi çûkên nizmîr tijî dikin, qure qure ji nêçîrê vedigerin.

Vedat Türkali, çepgir û rewşenbîrên tirkên dişibîne çûkên nizmîr û dibêje, ev heftê sal in, perwerdehiya zordar û yekalî, di pîrsa kurd de, ji tîlên bi zingar torek kişandîye serbanê mêjiyê mirovan. Mirovên herî bi kêrhatî jî nikarin ji torê wê de bifikirin. Ev dîtinên Vedat Türkali di kitêba "Özgürlük için Kürt Yazıları" de hatine zimên. Nivîskar, di vê kitêbê de, heşt nivîsên xwe yên di

navbera salên 1993-1994'an de, di rojnameyên Özgür Gündem û Özgür Ülke de hatine weşandin, dane ser hev. Di rûpela yekemîn de, nivîskar nîşan daye ku: "Hatine vê kitêbê, li ser destê Komela Mafên Mirovan, diyarî zarokên nexweş ên kurd ku bi zorê ji gundê xwe hatine koçberkirin kiriye. Şerê wan şerê me, azadiya wan azadiya me ye. Ez wekî nivîskarekî tirk, ji gelê bira yê kurd ê ku bi zordariya dewletê di nava eş û janê dijî, lêborînê dixwazim."

Di nivîseke xwe de V. Türkali dibêje: "Ez bi xwe jî di bin bandora Kemalîzmê de bûm. Komûnternê bawer kiribû ku, imperyalizma Îngilistanê li dijî dewleta proleterya dixwaze dewletek kurd ava bike. Ji ber vê ye ku wan rûyê xwe ji kurdan bada. TKP (Partiya Komünist a Tirkiyeyê) her çiqas serxwebûna kurdan bixwesta jî, nikaribû li derveyî biryara Komûnternê tişteki bikira. Yekcaran mirov xwe bi tenê his dike. Dibe ku mirov bîst milyon be jî, xwe bi tenê, çik tenê his bike. Gava ji mirov re silaveke germ, ji dil tî, wê gavê tenêbûn ji bir diçe. Mirov dibe bîst milyon û yek û wê çaxê mirov dibêje: "Em çiqas pir bûne."

Tu bi xêr hatî nava me kalê heştê salî. Tu bi xêr hatî.

Cezayîriyan Jean Paul Satre yê fransîz ji bir nekir. Em jî te û yê wekî te ji bir nakin.



# Şêra Şemrex Embaza Emine Akkuzu

**K**irdasî de jû vaten esta, a jî wina vajiyena: "Şêr şêr e, çi jin çi mêr." Ma ebi dimiliya jî, şenê wina vajê "Şêr şêr o, çi cenî çi mêrdêk." Na qîsa ya dîrokî raştiya xo, weşîna ma wa newî de cayê xo zaf rind mûnena ma. Kela Dimdim de, Şerê Agirî de, Terteleyê Dêrsim de, Şerê bakurê Kurdistan de û ewro jî seranserê Kurdistan de bi qeflana Arteşa Reynayînê Şerê Kurdistan miyan de ceniyen ma kurdan zey şêran şer kenê. Besê, Bêritan, Zilan, Bermal, Rewşen, Gurbetelli, Sema nê şê ra çend qehremaniyê.

Kurdistan de di şoreşî pêmiyan de awa bena. Şoreşa jewîn a kesan a, a didin jî a welatî ya. Jû kişt ra ma weşîna kewtin ra û kiştê bin ra jî welatê ma, dişmenî ra bena pak. Nê şoreşî pê miyan de û pê kalek de her gi roj tayna veraver şinê û ma dewijîna xo ra qerisyenê û benê neteweyê dinyaya newî. Kesî heta verê des pancês seran, ne kurdî û ne jî Kurdistan silasnayê. La belê ewro mayê vînenê ke, çahar kiştê dinyayî de namê welat û şexsiyetên ma yeno ziwan. Newe newe şar rûmet dano kurdan û Kurdistan. Zewbî jî, ceniyên ma jî cayê xo, ceniyên dinyay miyan de bi gûnî û ganê xo ya kenê hera. Weşêr bo înan rê.

Nê qehremanên ma yên ke bi rûmetî ra jew jî, embazeka Emine Akkuzu bî. Ma şaristanê Stenbol de pê silasnayê. Ê seran de zankeyan ra zaf embazî şiyê koyan ser û biyê gerîlayê şoreşê ma.

Embaza Emîne, heremê Mêrdîn ra, şaristana Şemrex (Mazidağ) ra bî. Sera 1987'î de kewt zankeyî û sera 1991'î de, sera çaharin de jî bî gerîla. A, wexto ke bî gerîla, Zankeyê Stenbol de Fakultê İktisadî de Têkiilîyên Navneteweyan wendê. Emine koyên Mazî ra amêbî ke na fakulte de biba zanekarê iktisadî. La belê ay winî nêkerd, zankey nîmjet ra viradê û bî şoreşgerê reynayînê şarê xo.

Embaz Emine zaf bêveng, zarweş û girane bî. Fekê ci zaf metîn bî, coka jî xeylê bawerîn dayê kesî. Ay vêşî qîsey nêkerdê, la belê wexto ke qîsey kerdê jî alinceyên xo, zaf kilm tepîştê û kes xo ra nêciznayê. Jewfîn embazan ci rê vatê: "Zewbî qîsey nêmendî, la belê ti fina jî bewn tûnika xo ra, beno ke tûnik de çiyê mendo." Verpersê nê kuşatan, ay wina dayê: "Tûnika min dirya ya û

qîsey pêriko jî rijyayê, qe jew jî nêmendê. Rojna jî esta embaz." Ay embazanê xo ra zaf hezkerdê û rûmet dayê. Kesî ra qe nêqaryayê, çend ke ci dest ra ameyê jî bi weşîna canikina paştî dayê.

A verê şiyînê Kurdistanî, nêweş kewtbî. Nameyê ci tûberkuloz

biyê. Embaza Emine şarî miyan de eylê xeftiyêbî. Herêmanên ke a te de xeftiyêbî ra, şar bi qec û qûlên xo ya ameyê nêweşxanî. Şarî, embaza ma wextê ziyaretê de qe rojê jî tenya nêveradayî. Bêguman bandorê nê aleqeyên şarî, weşbiyina Emine sero zaf vêşî estbi.

kuşan de beno, eke grewên veyşanî de û eke xeftiyayînê cepî de beno, zaf mardimî ra vêşêrê kar ardê ca. Bawerîna ke ay de estbî, qe kesî de jî çinêbî.

Embazanê ay ra jewerî, Emine wina ardê ziwan: "Emine zaf zarweş bî. Kes ci ra mird nêbiyê. Embazanê ci miyan de çepê tirkan ra jî xeylê wendoxî estbî. Ay weşîno xo ebi zanîna sosyalîzm û welatperwerîna şirêgnaybî. Ma miyan de, didi hîrê embazên zaneyê siyasî û îdeolojiyê ma estbî, înan ra jew jî embazeka Emine bî. Qandê dazanayînê şar û netewe Kurdistan, çepê tirkan miyan de hewl xeftiyayê. Ê seran de çepê tirkan miyan de şarî û netewiyeta kurdan problemo girdbî. La belê ê embazan, na problem weş akardê û dayên zanayin. Wexto ke Emine şiyê serwedarnanê welatperweran xo de embazên tirkî jî berdê. Çimki hindê wendoxên kurdî, ê tirkî jî kewtê bandorê ci bin. Cokra ma ci ra zaf hezkerdê û ci ra qiwet girotê."

Embaza Emine vêşî cixara şimitê. Cixara ke şimitê maltepe bî. Ez nika nêzana ay rojê de çend paketî qedî-nayê, la belê zaf şimitê. Embazan çend ke ci rê vatê: "Hind vêşî meşim" jî, ay goş nêdayê kesî. Qanê cixara ay wina vatê: "Na cixara min rê vêşî mevînê. Wexto ke ez nay şimena tayna weş fikrên xo û tayna weş karê xo ana ca. Zewbî jî cixara, weşîna bandorkaran ra tayn zirar dano gan û mêjgê kesî."

Embaza Emine, biguman sera 1991'î de, Stenbol ra abiryê û şî koyan bî gerîla. Wexto ke a şî gerîlay, embazanê ci ra zaf kesî rûmet girot. Çimki kesî vêşî nêpawitê aya şira. Çi rê ke sihata weşîna Emine qandê weşîna gerîlay hewl nêbî. La belê ay, çimanê xo veradabî weşîna tewrî berzîn û mirazê xo koyanê Dêrsimî de ard ca. Emine zey mirîçkanê azadey, koyanê Dêrsimî ser de perê perê û bahdo jî xo verada şaristanê Elazizî. Embaza delal û şîrîn, 3'ê pûşpera 1993'î de, bi Yadîgar Doğan û Nasir Zorluya sûka Elazizî miyan de, jew keyî de kişt polisanê tirkan ra şehîd kewt. Weşêr bo to rê, mirîçika azadey û şêra Şemrexî. Bawer bike ke şarê Kurdistanî, to xo vîra nêkeno.



(merez) bi. Qandê co hîrê mengî Adayê Heybelî de tedawî dî. Wexto ke ay Heybelî de tedawî diyê, şarî ra zaf merdimî şiyê ci hetek û ci ra ravêrîn waştê. Embazên wendoxan ra jî xeylê embazî şiyê ziyaretê ci. Ê rojan de eke kam şiyê ci hetek, newedin ra kewtê bandorê embazîna ci bin. Çimki înan, embazîna ay û şarî, nezdî ra diyê û ci ra kêfweş

Çimên Embaza Emine weş nêdiyê. Nimrên verçimka ci, xeylê vêşî û çerçova ci jî girs bî, eke verçimk nêdayê çimanê xo ver, ray nêdiy. Cokra verçimk bîbî leteyê ganê ci. A zaf zihîf bî. Kesî vetê a qe nan nêwena û tim û tim veyşan û teyşan manena. La belê bi a hala, merdimên xoserê ra xeylê vêşî gurwe qedînayê. Eke serwedarnane




□ 24 tîrmeh 1923:

**Peymana Lozanê hate îmzekirin**

Li Lozanê di navbera heyeta tirk û Îngilîz de guftûgoyan dest pê kirin. Serokê heyeta tirk İsmet İnönü û yê Îngilîzan jî Lord Curzon bû. Piştî gelek guftûgoyan jî bilî Herêma Mûsilê, tirk û Îngilîzan li ser sînorên Tirkîyeyê yê îro li hev du kirin. Di sala 1926'an de jî li ser doza Mûsilê jî li hev du kirin.

Herêma Mûsil û Kerkukê ket bin bandora Îngilîzan û Kurdistan parçe bû. Paşê Îngilîz parçeyê di bin bandora xwe de da Iraqê û Frensiyan jî yê xwe da Sûriyeyê. Ji wê rojê şûn de Kurdistan bû çar parçe.

**BÛYERINE JI DÎROKÊ**

□ 22 tîrmeh 1943:

**33 gundiye kurd hatin qetilkirin**

Li Bajarê Wanê, Navçeya Ebex (Özalp) li Newala Sefo 33 gundiye kurd ji hêla leşkerên tirk ve hatin qetilkirin. Leşkeran di bin fermandariya Orgeneral Mustafa Muğralı de ev tevkûjî pêk anîn. Li Wanê qirîkirin pêk hat.

□ 19 tîrmeh 1993:

Komek tîmên taybet avêtin ser Zozana Sunduzê ku girêdayî navçeya Mîksa Wanê ye. Di vê êrişê de 15 zarok, 8 jin bi tevahî 23 kes hatin kuştin. Her çiqas dewletê xwast vê qirîkirinê bixê stuyê PKK'ê jî bi ser neket.

## Şehîdên rojiya mirinê hatin bibîranîn

# Felsefeya wan dom dike

Kemal Pîr, Hayri Durmuş, Akif Yılmaz û Ali Çiçek di Gertîgeha Amedê de 14'ê tîrmeha 1982'yan ji bo protestokirina wehşeta dewletê ya li ser gelê kurd berxwedana rojiya mirinê dan destpêkirin.



Roja 12'yê tîrmehê li Navenda Çanda Mezopotamya şaxa Stenbolê ji bo bîranîna berxwedêrên meha tîrmehê ji aliyê Teatra Jiyana Nû ve çalakiyek hate lidarxistin. Çalakî bi gotina "Şehîd nîrxên herî girîng in. Ew fermandar in, em fermanber in." dest pê kir. Pêşkêşên bernameyê ji kovara Jiyana Rewşenê Kawa Nemir û ji Teatra Jiyana Nû Fatma Akbal bûn. Bîranîn ji bo şehîdên meha tîrmehê û hemû şehîdên şoreşê yê din, bi deqîqeyek rawestîna rêzgirtinê dest pê kir. Kawa Nemir di axaftina vekirina bernameyê de got: "Li hemberî artêşa barbar, artêşek biçûk di nav dîwaran de bi canê xwe bi ruhê xwe li ber xwe dida. Felsefeya ku wan afirand hê dom dike."

Ji aliyê endama Teatra Jiyana Nû Yıldız Gültekin ve şanoyeke takekesî hate pêşkêşkirin.

Dîaya ku ji aliyê TUHAD-DER'ê ve hatibû amadekirin ligel dirûşmeyên wekî "Bijî berxwedana me ya 14'ê tîrmehê, bijî rojiya mirinê", wêneyên berxwedêrên 14'ê tîrmehê Kemal Pîr, Hayri Durmuş, Akif Yılmaz, Ali Çiçek, gotinên wan û gotinên ku li ser wan hatibûn gotin, hatin pêşkêşkirin. Fîlmê duduyan ê dîayê li ser 10 kesên ku 24'ê rezbera sala 1996'an de di Zindana Amedê de bi lêdanê hatibûn kuştin û wêneyên berxwedana rojiya mirinê ya sala 1996'an bû ku li zindanên cur bi cur de pêk hatibû. Dûre Helbestvan Hüseyin Şahin ku 14 salan di zindanê de maye û tevî rojiya mirinê bûye hate ser sehnê û çend helbestên xwe pêşkêşî mêvanan kir. Di nav helbestên wî de bi taybetî ya ku naveroka li ser aştiyê bû ji aliyê temaşevanan ve gelekî hate ecibandin.

Bernameya bîranînê ji aliyê pêşkêş Kawa Nemir ve bi xwendina helbesteke bi navê "Leşkerê wînda" dom kir.

Xwişka Vedat Aydemir Melihe Aydemir ku 1996'an de li Zindana Bayrampaşaya Stenbolê ji bo şermezarkirina 10 kesên di Zindana Amedê de bi îşkenceyê hatibûn kuştin, xwe şewitandibû hate ser sehnê û li ser birayê xwe Vedat Aydemir wisa got: "Vedat gava ev livbazî kir bîst salî bû. Em çûn nexweşxaneyê, pê re axivîn, Vedat ji me re wiha digot: 'Di Zindana Amedê de 10 hevalên me mêjiyên wan hate parçekirin, hatin kuştin. Ez nikaribûm bêdeng bimama'."


Ji malbata girtiyar endamê TUHAD-DER'ê Gazi Eldemir jî girêdayîna xwe ya bi nîrxên şehîdan ve anî zimên û wiha got: "Em ala wan li erdê nahêlin." Bername ji aliyê endamê Teatra Jiyana Nû Kemal Ulusoy ve bi pêşkêşkirina pandomîmê dom kir.

Seroka Navenda Çanda Mezopotamya Nurray Şen jî axaftinek kurt kir û helbestek ku li ser Sema Yüce bi sernavê 'Sema' xwend.

Di vê beşa xwendina helbestan de helbestvan Şükrü Erbaş jî hat ser sehnê, axaftinek kurt kir û helbest xwendin. Şükrü Erbaş wisa got: "Divê ev keder xelas be. Divê bi gavek zûtir xelas be." Her wiha Erbaş qala wehşeta Zindana Amedê ya sala 1982'yan kir û wisa got: "Ji min re dibêjin tu tirk î? Erê ez tirk im, lê ew wehşeta li ser girtiyar min nekiriye."

Bernameya bîranîna şehîdên berxwedana rojiya mirinê, 14'ê tîrmeha 1982'yan bi konsera Koma Azad bi dawî bû.

C. ANDOK/ STENBOL

**ÇAVDÊRÎ**

Jiyana bi hişmendî û ciwanên kurd li Siwêdê

MÎRHEM YİĞİT

Jiyana bêşûr çendî jiyane û bi kêrî çî têt? Mêjiyê belexwarî ji bo mirov çî be hiş û şûr ji wiha ye ji bo jiyane. Jiyana biaqil û fikirlêkirî hem ji bo roja hazir û hem ji bo ayendeyê (wêbê) dibe ders, kelepor, zanîn û piştqewînî. Em îro vê ji duh baştir dibînin û hejmareke ne mezin be jî beşek ji xwenda, siyasî û welatparêzên gelê me hewl didin ku li gorî vê rastiyê rabin û rûnin. Welat û derveyî welêt li hev nêzik dibe, û em jî divê ji vê prosesê re bibin alîkar. Bi qasî ku hewcedariyên me yê li derve bi agahdariya li ser welat heye, ne bi eynî derecê be jî yê li ser ax û ava bav û kalan jî dixwazin bizanibin em "welatparêzên" li derve çî dikin û çendî em bi berpîrsî dijîn.

Dawiya pûşperê 17 keç û xortên kurd li Swêdê zelzeleyek rakirin. Ev du hefte ne kurd û hefteyek e jî ku medya û çapemeniya Swêdê biryara van ciwanên Kurd munaqêşe dikin. Du sê rojan di rojnameyên mîna Dagnes Nyheter de ku rojnameya herî mezin e û di giş kanalên televizyona de raya giştî hejiya.

Ez dixwazim sedema vê bi nameya ciwanan nîşanî we bidim:

"Ji ciwanên Kurdistanê yê Swêdê re!

Berî her tiştî em dixwazin tesîra şerê taybetî ya li ser xwe behs bikin. Welatê ku em lê dijîn bi her awayî dixwaze me li vê derê asimîle bike. Dixwaze ciwanên Kurd ji kurdayetiya wan dûr bixe û her wiha têxe nava jiyaneke xweperest, pûç û vala.

Mixabin û sed mixabin gelek ciwanên me ketine bin bandora vê sistema qirêjî. Divê em di vê zanebûnê de bin ku şerê taybetî rêxistinên xwe di her derê jiyane de çêkirine. Ji dibistanê bigire heta malê. Ji mamoste bigire heta bi malbatê. Şerê taybetî bêyî ku tu zanibî, bêyî ku tu hîs bikî wekî jehrê tev li xwîna mirov dibe û mêjiyê mirov av dide. Şerê taybetî şexsiyeteke xweperest, bêbiryar, bêbawer û bêşexsiyetyê çêdike. Me çavên xwe vekirin û rastiya xwe, rastiya gelê xwe û rastiya şoreşa xwe dît. Dema ku em gihan hev û du me berî her tiştî nêzîkbûna ku pêwîst e hebe di gelê me de dît. Her yekî jî me xwe bi baweriyek mezin û bi girêdaneke xurt li pêşberî partiya xwe, gelê xwe, şehîdên xwe û şoreşa xwe berpîrsiyar dît. Bi vî awayî em gihan vê biryarê; biryara ku heta dawiyê di riya rast de bimeşin û di bin hemû mercan de li ber xwe bidin.

Hevalno!

Bang û hêviyên me ji we ev in: Hûn jî çavên xwe vekin, rastiya jiyana xwe bibînin û xwedî li şoreşa xwe, gelê xwe, welat û şehîdên xwe derkevin. Em hêvîdar in ku her yek jî we ku xwe berpîrsiyar bibîne û cihê xwe di nava tevgera rizgariya neteweyî de bigire.

Ji bo vê bi rih û bi fikir Kurdistanê ji xwe re hedef bigirin.

Em di riya şehîdên Kurdistanê de diçin. Em dê pêtên agir ên nava dilê Mazlûm û Egîdan, Zîlan û Bêrîtan û Ronahî û Bêrîvanan gurtir û xweştir bikin. Em dibin bersivê ji bo şehîda nemir Şehîd Hêlîn ku ji vir jî Swêdê ji nava me derket û bi qehremanî bû bûka welat. Em di riya xweşîkbûnê de di riya azadiyê de diçin.....Bizanibin ku azadiya gelê me bi ciwanan e.....Bijî Şoreşa Ciwanan .....Bijî bijî ....bi silavên germ Ciwanên 98' an yê Swêdê. 29/6/1998 "

Ciwanên îmezeyên xwe avêtin binê vê bangê ev demek e terka Swêdê kirine û ji bo xebatên cidîtir û profesyonelîtir ketine rê . Li pêştir em dê hinekî din li ser vê nameyê û bandora wê bisekinin.



# Şahîdê dîroka Nêzîk ya Qewimînên dawî

Saddam zalim e, lê Tirkiye ji wî zalimtir e. Kurdên Iraqê bi zimanê xwe dizanin, gelek rewşenbîr bi zimanê xwe dinivîsin. Lê li Bakur, kurd bi zimanê tirkî mezin dibin. Lê li Ewrûpayê jî em nikarin bi zimanê xwe bipeyîvin û hîn bibin. Dîsa jî rewşa kurdên bakur hêdî hêdî diguhere. Ji bo civîna parlamentoyê (PKDW) jî Sidney û Rusyayê kurd hatibûn. Ev tiştê gelekî mezin û hêja ye.

## Ronakbîrekî Têrdîtî

Îsmet Şerîf Wanly, 72 sal temen kiriye. 49 sal jê, nîv esir li derveyî Welêt derbas bûye. Di sala 1924'an de li nêzîkî Şamê li gundekî kurdan ji dayik bûye. Di avakirina Mahabadê de xortekî ciwan bûye. Li Swedê di warê felsefe û hiqûqê de diploma wergirtiye û dersên siyasetzaniyê raber kirine. Her wiha di salên 1960- 1962'an de jî li Zanîngeha Sorbonê li ser Kurdnasiyê ders raber kirine. Lê piştê li ser daxwaza Mele Mistefa Berzanî derbasî Başûr bûye û wekî diplomatekî xebatkar û çalak kar kiriye. Wanly bêhtir bi karê dîroknasiyê rabûye. Li ser dîrok kurdan gelek lêkolînên wî hene û hin ji wan bo zimanên biyanî hatine wergerandin. Vê dawiyê bi navê "Bi Çavên Gerokên Kevn ên Rojavayî Kurd û Kurdistan" pirtûkeke wî derket. Îro di Parlamen-toya Kurdistanê ya Li Derveyî Welêt de, Serokê Komîsyona Çandê ye. Ew li Lozanê bi cih û war bûye lê her roj ji bo doza Kurdistanê li paytexteke welatekî Ewrûpayê ye. Jê re rehetbûn tune ye. Prof. Îsmet Şerîf Wanly wekî çinareke ku li "Henderanê (Welatê Xeribiyê)" ye û tim û tim sax dide.



Êz dixwazim hemû kurd vegezin welatê xwe. Kurdên ku li derveyî Kurdistanê ne, ji Kurdê Kurdistanê zêdetir in. Hemû kurd, bila li ziman û kultura xwe xwedî derkevin. Televîzyona tirk pîr pîs û qirêj e. (Di wêne de Wanly digel hevala xwe tê dîtîn.)

Hevpeyvîn: İHSAN KURT/SWÎSRE

**M**e dil heye, hûn pêşîn hinekî behsa Îsmet Şerîf Wanly û jiyana wî bikin. Hesreta Îsmet Şerîf Wanly çi ye?

♦ Wêleh, ji bo min wexta hesretê tune ye. Lê ez pê dizanim ku gelek karê me heye. Ev karûbar li pêşiya me ne, gerek e em bikin. Li ser şexsê xwe ez li tiştêkî nefikirîme. Lê, hesreta hemû kurdan dewletbûna Kurdistanê ye.

Baş e, em navê hesretê bikin hêvî.

♦ Hêvî pêwîstiyek e. Bêhêvî em nikarin tiştêkî bikin û bijîn. Lê hêvî bi tenê bi kêr naye. Eger ku em kar nekin, hêvî jî peyda nabe. Her kurd ku di cihê xwe de kar bike û li ber xwe bide, em dê mala Kurdistanê ava bikin, lê pirê kurdan kar nakin.

49 salên we li derveyî welêt derbas bûne, ev beramberî temena mirovekî/eye. Em dikarin ji bo van salan bibêjin, salên vederbûnê?

♦ Ne tevayî sirgûn (vederbûn) bû. Ez li Kurdistanê, li bajarekî piçûk, li nê-

zîkî Şamê mezin bûm. Gava ez hatim Ewrûpayê, ez 23 salî bûm. Min bi fransî zanibû, kultura min hêjayî Ewrûpiyan bû. Di 7 saliya xwe de min dest bi fransî kir. Lê gava ez hatim Ewrûpayê, min zanibû ku ez kurd im. Ez gelekî hez ji karaktera mirovên Swisreyê dikim. Ew derewan nakin û durist in.

Ez bawer dikim derewên me ji tirsê tî. Ev tirs jî, ji bindestî û zordariyê tî. Yanî karakterê kolonyalîzmê li me hatiye kirin. Li Şerqê karkerî eyb e lê li vir ne eyb e. Li Şerqê divê tu axa bî, ji bo ku qîmeta te hebe. Ez vê yekê, ne ji bo hemû kurdan dibêjim.

Di sala 1974'an de min ji bo wergirtina pasaporta Swisreyê serî lêda. Komîsyona parlamentaran ji min pirsî hemûyan ez nas dikirim: "Tu kurd î. Tu bo çi pasaporta Swisreyê dixwazî?" Min gote wan: "Ev mesele ne kaxiz e. Ev ji 20 salan zêdetir e, ez li Swisreyê me, min heq heye, pasaportê wergirim." Her wiha min got: "Ez nikarim wekî we bibim, wekî we bifikirim û wekî we bibim Swisreyî. Eslê min kurd e, ez kurd im, ez dê kurd bimînim û xizmeta Kurdistanê bikim. Lê ez hemwelatîyê Swisreyê me, ez hez ji Swisreyê dikim. Lê ez ni-

karim ji bo Swisreyê tiştêkî bikim û ez nakim jî."

Birêz Wanly, bo we dibêjin, dîroknas e lê we bi xwe, rojên herî girîng ên dîroka Kurdistanê bi çavên serê xwe dîtine...

♦ Jiyana min, baweriya min ji bo kurd û Kurdistanê ye. Eger ez bibêjim, ez kurd im û tiştêkî ji bo Kurdistanê nekim, heqê min tune ye bipeyîvim. Ez jî dibim mirovekî nebaş.

Di van pêncê salên ku hûn li derveyî Welêt bûn, li Kurdistanê gelek tişt pêk hatin. Ji bo we, ev sal çawa derbas bûn?

Di sala 1961'ê de, ez li Zanîngeha Sorbonê mamoste bûm. Mele Mistefa ji min re nameyek şand, li ser vê yekê ez çûm Kurdistanê Başûr. Mele Mistefa, ji min xwest ku, ez ji bo welat xebatê bikim. Ev tişt gelek muhîm bû ji bo min. Şoreşa salên şêstî heta sala 1975'an berdewam kir. Paşê şoreşa Kurdistanê Îranê çêbû. Malesef ev her du şoreş jî neçûn serî. Dawiya herduyan jî xerab bû. Ku paşiya şoreşa Başûr wisa bû, ez gelek xemgîn bûm. Armanca Mele Mistefa gelek mezin bû lê neçû serî.

Xuya ye, rêzgirtina we bo Mele Mis-

tefa Berzanî gelekî xurt e. Gelo bi baweriya we di nav PDK'ê ya îro û berê çî ferq heye?

♦ Di wexta Mele Mistefa de ev qas partî tunebûn. PDK-Tirkiye û PDK-Suriyê hebûn. Lê tîkiliya wan bi tirkan re tunebû.

Hûn helwesta PDK'ê ya îro çawa dinîrxînin?

♦ Berê tîkiliya kurdan bi hev re baş bû û li başûrê Welêt birakujî tunebû. Her wiha kurdên parçeyên din jî alîkariya kurdên li Başûr dikirin. Ez bi xwe ji Başûrê Biçûk bûm lê ez bi wan re dimeşiyam. Lê paşê xeletî kirin. Ji bo wê jî nemeşiya. Di wexta Mele Mistefa de di nav kurdan de şer tunebû.

Gelo em dikarin bibêjin, Mesut Berzanî doza bavê xwe dimeşîne?

♦ Na. Malesef nameşîne. PDK îro bi Tirkiyeyê re hevkarîyê bike, tu kar naçin serî. Ev tiştêkî pir xerab e.

Ev ji salekê zêdetir e, em qala kongreyê neteweyî dikin. Hûn der barê vê yekê de çî difikirin?

♦ Anîha sê partî hene; PKK, PDK, YNK. Partiya din jî hene. Lê ger ev her



# Kurdan Îsmet Şerîf Wanly: Nê gelekî hêja ne

sê partî di nav xwe de yekîtiyekê çênekin, pêkhatina kongreyê zehmet e. Ev sê partî yek bin, yên piçûk jî dê mecbûr werin ser vê riyê. Maalesef ev îmkân tune ye. Tirsê min berde-wambûna vê nexweşiyê ye. Ku wisa dewam bike, wê ev şer gelek tiştan bişikîne. Em dibînin, partiyek bi ya din nikare.

*Baş e. Çareya vê meseleyê çi ye?*

◆ Ev partî ne wekî hevdu ne. Lê îro şerê hev dikin. Em dibêjin her du jî kurd in. Gerek e berî her tiştî di wan de platformeke minimum hebe. Ez dikarim hemû partiyan rexne bikim. Lê aniha ez nikarim. Mesûliyet ne yek alî ye. Ji bo çareserkirina vê nexweşiyê, ez dê dest bavêjim hinek tiştan. Ez dê tiştinan bikim. Ew nikarin hevdu biqedînin.

*Me dil heye, hûn rewşa rewşenbîrên kurd binirxînin? Gelo bi rola xwe radibin?*

◆ Gelek rewşenbîrên kurd hene, lê faaliyetên wan kêmtir in. Li ser kaxizê gelek tişt hene û çêbûne. Navê wan jî xweş e, lê faaliyetên wan tune ne. Nizandin kar bikin. Bi zimanê xwe nizanin. Tecrûbe bi çend kesan re heye lê kêmtir e. Lê ez pê bawer im, em dikarin tiştên baştir bikin.

*Daxwaziya we çi ye ji rewşenbîrên kurd?*

◆ Rewşenbîrê me wekî karkeran in. Lê karker ji wan zêdetir dixebitin. Hinek baş, hinek jî hindik kar dikin. Lê hinek jî bûne xwedî mal, jin û zarok û her tişt ji bir kirine.

*Ev rewşenbîrî ye?*

◆ Na, ne rewşenbîrî ye. Ez bawer im, ew dixwazin bi jin û zarokên xwe re bijîn. Eger bibêje ez kurd im û ji bo kurdîtiyê tiştêkî neke, ev ne rewşenbîrî ye, ev bêşerefî ye.

*Diyar e, li Ewropayê rewşenbîrî hinekî erzan e...*

◆ Cuda ye. Ne wekî hevûdu ne. Rewşenbîrên kurd pir in. Belkî nivê rewşenbîrên kurd li derve ne. Ez tiştêkî din jî bêjim ku rewşenbîran aciz dike.

Îro li Kurdistanê di nava siyasetê de şer heye, ev yek rewşenbîran aciz dike. Ev şerê tesîreke xurt li rewşenbîran dike. Ez bi xwe jî vê yekê hez nakim. Gelê kurd di nav hev de pir xwînê dirijîne.

*Bû niv esir ku hûn li derveyê welêt in. Ji Ewropa hetanî Awusturalya û Kanadayê bi milyon kurd li sîrgûnê ne. Nişfekî nû li sîrgûnê peyda dibe. Şîreta we, bo nişên nû çi ye?*

◆ Ez naxwazim kurd welatê xwe terk bikin. Ez dixwazim hemû vegerin welatê xwe. Kurdê ku li derveyê Kurdistanê ne, ji Kurdê Kurdistanê zêdetir in. Li zimanê kurdî û kultura kurdî xwedî dernakevin. Televîzyona tirkî pir pis û qirêj e. Hemû kurd, bila li ziman û kultura xwe xwedî derkevin lê zêdetir divê yê derveyê Kurdistanê lê xwedî derkevin.

## PKK, Rojava û Marksîzm

### Meseleya kurd meseleya miletekî ye

*Gelê kurd tekoşîneke pir giran da û hîna jî li ber xwe dide. Bû 50 sal, hûn şahidê vê tekoşînê ne. Hûn vê serdemê çawa dinirxînin?*

✓ Miletê kurd pir tekoşîn da. Xwîn wekî rûbar kişiya. Lê dîsa tim û tim xwîn dirije û dike.

*Hêviyên we, wan salan geş bûn an îro?*

✓ Wê gavê hemû rojnameyên cîhanê li ser mesela kurdan disekin. Ji Awistralyayê hetanî Amerikayê rojnameger dihatin bi me re dipeyivîn. Lê îro zehmet e.

*Ji bo çi zehmet e?*

✓ Sebeba vê yekê, bingeha şoreşa Kurdistanê û rêveçûna dewleta tirk e. Tirkîye wekî Amerika û dewletên Ewropayê endamê NATO'yê ye. Lê PKK rêxistineke Marksîst-Lenînîst e. Welatên rojavayî jî bi vê yekê aciz dibin.

*Doza Marksîsm-Lenînîzmê ji bo gelê kurd kêmasî ye an zengînî ye?*

✓ Ez ji kapîtalîzmê hez nakim. Lê baweriyê min bi Marksîzm-Lenînîzmê jî nayê. Tatbîka wê xelet bû. Aniha PKK bi Tirkîyeyê re şer dike. Tirkîye endamê Natoyê ye û hevalbendê Amerika û Ewropayê ye. Yanî li cem Amerîka û welatên Ewropayê tirk jî kurdan giranbihatir in. Ev mesele ne meseleya prensîbên hiqûqî û mirovatîyê ye. Mesele ne mesele mafê mirovatîyê ye. Ew hemû derew in û li ser kaxizê dimînin. Eger hêz û quweta te hebe, tu dikarî heqê xwe bistîni. Lê ku tu nikarî kes nade te.

*Yanî hûn dibêjin, em bi heq bin jî eger em xurt nebin, nikarin dawê bibin serî?*

✓ Eger ku hêza te hebe û tu tesîrê li cîhanê bikî, ew mecbûr in hesabê te bikin. Lê îro pir hesab nakin. Serê her mehê, em konferansêkê li dar dixin. Ez her tim beşdariyê tê de dikim. Kêmtir û zêde eynî kes tînin konferansê. Profesor in, nivîskar in, nizanîm çi ne! Ev kes mafên kurdan diparêzin. Lê ne xurt û desthilatdar in. Dibêjin, ev heqê mirovatîyê ye, heqê mezlûman e, Tirkîye zilmê li kurdan dike,


nizanim çi... Lê kes nabêje, ev mesele miletekî ye. Bi tenê dibêjin, Tirkîye çima heqê mirovatîyê îhlal dike. Lê bi rastî li holê, mesele miletekî heye. Ewropa û Amerika êdî vê mesele dibîne. Armanca PKK'ê fêm dikin. Mesele li başûrê Kurdistanê PDK û Mele Mistefa digot: "Otonomî ji bo Kurdistanê, demokrasiya ji bo gelê ereb." Ez bi wê demokrasiyê bawer nakim, derew e. Îro Saddam heye, sibe yekî din wê were. Lê PKK dibêje, em mîlet in, heqê me hene. Belê îmkânê me tune ne lê stratejiyêke me heye.

*Dîsa em vegerin ser hêviyê. Ev stratejî hêviya we ye?*

✓ Belê. Min pirtir bi rewşa kurdên Suriye, Îran, Iraqê zanibû. Min

Mele Mistefa digot: "Otonomî ji bo Kurdistanê, demokrasiya ji bo gelê ereb!" Ez bi wê demokrasiyê bawer nakim. Îro Saddam heye, sibe yekî din. Lê PKK dibêje, em mîlet in, heqê me hene. Îro qet nebe stratejiyêke me heye.

berî vê bi deh salan kurdên Tirkîyeyê jî nas kirin. Min her dem dixwest, ez wan nas bikim. Berî ku ez kurdên Tirkîyeyê nas bikim, min digot ew gelekî mîletperwer in. Lê gava min ew nas kirin, ez hêvîşkestî bûm. Tesîra kolonyalîzma (mêtingerî) tirkan pir pis e. Kurdên Tirkîyeyê pir xerab bûbûn. Rewşa wan gelekî zor e. Hin ji wan dibêjin 'em tirk in', beşeke mezîni jî bi kurdî nizanin. Parçeyekî mezîni jî gotin "em kurd in" û lê bi PKK'ê re şer kirin. Li aliyê din tesîra Tirkîyeyê pir zêde ye li ser kurdan. Saddam zalim e, lê Tirkîye ji wî za-



Î. Şerîf Wanly di dema daxuyaniyêke çapemeniyê de tê dîtin.

limtir e. Kurdên bi Iraqê zimanê xwe dizanin, gelek rewşenbîr bi zimanê xwe dinivîsin. Lê li Bakur, kurd bi

zimanê tirkî mezîni dibin. Li Almaniyayê jî wisa ye. Ev tişt gelek min aciz û xemgîn dike. Em dibêjin, em mezlûm in, Tirkîyeyê zimanê me jî ji dest me standiye, lê li Ewropayê jî em nikarin bi zimanê xwe bipeyivîn û hîn bibin. Çima em li Ewropayê bi tirkî dipeyivîn? Em ji bo xwendin û nivîsina bi kurdî hewl nadin xwe. Ev ji ber tiralî û sersariya me diqewime.

Yanê îro kurdên Bakur, erdê xwe dihêlin û tînin, madenê xwe dihêlin, çi dimîne dawiyê! Kurdîtiya li ku ma? Çar milyon kurd li Stenbolê dijîn, rewşa wan û ziman çawa ye, em pê nizanin. Ev hinekî kêmasiya rewşenbîran e jî. Lê îro rewşê hêdî hêdî diguhere. Ji bo civîna parlamentoyê (PKDW) ji Sidney û Rusyayê kurd hatibûn. Ji Başûr û Bakur gelek kurd bo civînê hatibûn. Ev tiştêkî gelekî mezîni û hêja ye.



*Helbestvanên kurd ên bi erebî dinivîsin:*


# Mêrek pala xwe dide avê

Serpêhatiya helbestvanên kurd ên ku bi erebî dinivîsin, çîroka bilbil û qirakê tîne bîra mirov. Qirakê xwest tevî refên bilbilan be, lê di dawiyê de her du refan jî ew nehewandin. Bi hêviya ku nivîskarên kurd ên bi zimanê biyanî dinivîsin, nema pala xwe bidin avê û li ziman û toreya xwe xwedî derkevin, da ku bikaribin pala xwe bidin dîwarên rastiya xwe.

HELÎM YÛSIV

Ev hevok, wergera sernivîsa dîwaneke helbestên erebî ye, ku bi pênuşa helbestvanê kurd Selah Dawûd hatiye nivîsandin. Berî ku ez li ser helbestên Selah rawestim, ez dixwazim hinekî li ser rewşa helbestvanên erebînivîs yên li Başûrê Biçûk bipeyîvim. Di van salên dawî de, gelek navên kurdî derketin holê, ku di helbesta erebî de (li Sûriyeyê) bala xwendevanan kişandin. Serpêhatiya van helbestvanan çîroka bilbil û qirakê (qijak) tîne bîra mirov. Dema qirakê, per û baskên xwe yên reş rengîn kirin û kete nav refê bilbilan û xwest li nav bilbilan bistirê, hemû bilbilan bi awayekî xwe jê dûr xistin û firriyan. Qixeqixa qirakê, bilbil cefilandin. Vêca xwest vegere nav refên xwe. Dema ji wan ve nêzik bû, qirakan ji hev re gotin: "Wa bibilek hat" û ew nehewandin nav xwe. Bi vî awayî qiraka perî rengînî ma bi tenê. Ne refê bilbilan ew pejirand û ne jî refê qirakan rê li ber vegera wê vekir.

Bi temamî rewşa gelek ji van nivîskarên me, mîna rewşa vê qirakê ye. Her wiha tev de pala xwe didin avê. Ji nîfşê çûyî, Selîm Berekat mîna keke di cih de ye. Helbestvan û nivîskarên ereb, ên ku nivê Selîm nayên, bi şev û roj xelatan qezenc dikin û di televîzyon, rojname û radyoyên ereban de cihê xwe girtine. Ev kes jiyana xwe hema bêqiriktalî û belengazî diqedînin lê ne ji mecbûrî be, navê Selîm li cem wan nayê gotin. Nemaze sazgehên fermî tu carî bala tu kesî nakişînin ser wî û kesên wekî wî. Eger mecbûr bûn jî, di quncikên tarî de, di ser navên wan re derbas dibin. Lê ew bi xwe navên wekî Mihemed Kurd Elî, Ebas Eqqad û Ehmed Şewqî ne wilo tînin zimên. Çimkî wan ereb dihesibînin. Her wiha ev kes, ji hêla kurdan ve jî xweşik nayên pejirandin, ji ber ku ne bi zimanê xwe nivîsandine. Dibe ku ev nêrin rast be, an jî şaş be, lê mebest ew e ku, xelek li van nivîskaran teng bûye. Bêguman gunehê wan jî di tengkirina vê xelekê de heye. Wekî mînak ez ê çend navên xwedî berhemên çapkîrî bihejmêrim: Taha Xelîl, Luqman Mehmûd, M. Eff Huseynî, Cemil Darî, Luqman



Selîm Berekat

Dêrkî, Hisên Bîn Hemzê, Nesret Hebeş, Brahmî Yûsiv, E. Muqsîd Huseynî, Munîr Xelef... û Selah Dawûd, ku yek ji van helbestvanan e, xwedî dengêkî sivik û nerm û zelal e. Bêteqereq helbesta xwe li ser jiyana xwe ya rojana û tiştên xwe yên biçûk dinivîsîne:

*Û aniha, kîjan bêrika bêhiş  
Wê destê- bi tenê- germ bike (rûpel 6)  
Û ji jina spehî re dibêje:  
Ez ê li bendemana xwe bidim te  
û mîna gulekê zerbûyî  
ez ji te dikevim (rûpel 7)*

Helbestvan şikestinên xwe venaşere, lê qêrînen nava xwe jî li ber me ranaxîne. Tenê di rîya wêneyan re pêçeka birînen xwe belawela dike:

*Dema min xwest ez bistirê  
Çivîkên mirî ji devê min weşiyay (rûpel 9)*

Piştî çûna yarê xwe ji bîr dike, xwe winda dike, ne dil ew dil e, ne hiş ew hiş e, ne jî hest dikarin ji gewdeyê xwedî derkevin, lê gelek caran, mirov dereng bi xwe hest dibe:

*Piştî te...*

*Carekê tenê min nas kir  
ku bêhna 'yasmîne' nehatiye guhartin  
û ji demekê dîr û dirêj de  
ez negiriyame (rûpel 12)*

Bêgunehkarî Selah pirsên xwe dirêse, bi hiş û çavên zarokêkî, li şûna yara wêran dinihêre û dipirse:

*Te çima hêstrên xwe  
li ser zenda min ji bîr kirin (rûpel 38)  
Yan jî şinkahiya darê û serbilindahiya  
wê tîne ber çavan dema yar nêzik dibê:  
çivîk li ser piyê min in  
û mîna daran şipya dimînim  
şaxên min xwe dirêj dikin  
Da te hembêz bikim (rûpel 42)*

Li ber yara spehî mat dimîne. Nema dizane bi ku de bizivire, dema Xwedî bi xwe di rûyê wê de xwe diyar dike:

*Ez ê çawa  
berê xwe bi ezman ve kim  
û Xweda di rûyê te de ye (rûpel 46)*

Her wiha berê xwe dide gundê xwe Hiyamlî, ku ji herêma Efrînê ye. Guhdide serpêhatiyên kevîran, bi hestên tenik diçe ber bi evîneke kevîran de û

Bi temamî rewşa gelek ji van nivîskarên me, mîna rewşa vê qirakê ye. Her wiha tev de pala xwe didin avê. Ji nîfşê çûyî, Selîm Berekat mîna keke di cih de ye. Helbestvan û nivîskarên ereb, yên ku nivê Selîm nayên, bi şev û roj xelatan qezenc dikin û di televîzyon, rojname û radyoyên ereban de cihê xwe girtine. Ev kes jiyana xwe hema bêqiriktalî û belengazî diqedînin lê ne ji mecbûrî be, navê Selîm li cem wan nayê gotin. Nemaze sazgehên fermî tu carî bala tu kesî nakişînin ser wî û kesên wekî wî.

mîna gelek gundên kurdan gundê wî jî di nav çiya û daran de winda dibe:

*Kevîrên reş li ser  
hezkirina kevîran dipeyivin  
yên ku bi ewran re  
ew bi tenê hiştine  
û 'Hiyamlî' di nav du çiyayên de ye  
di nav du bombeyan de ye (rûpel 54)*

Helbesta Selah Dawûd bi sivikahiya jiyana rojana hatiye xemilandin û dûrî qerebalix û babetên mezin û giran dikeve. Bi vî awayî carina cihokên helbestê bi hêsanî diherikin û carina jî bêav in. Lê tim ne dûrî hinavê mirov in.

Bêguman ev gaveke yekemîn e di serboreya Selah Dawûd de û bi hêviya ku nivîskarên kurd ên bi zimanê biyanî dinivîsînin, nema pala xwe bidin avê û li ziman toreya xwe xwedî derkevin, da ku bikaribin pala xwe bidin dîwarên rastiya xwe.

**Nîşe:** Ev berhevok (Dîwan) ji Weşanên Darulsedaqa-1997, li Helebê hatiye çapandin. Wêneyê bergê yê hunermend Nîhad Turk e.



Li Navenda Çanda Mezopotamyayê ya Stenbolê

● 18 tîrmeh 1998 şemî: Konsera Koma Rojhilat, saet:15.00

Panela Înstîtuya Kurdî Rêvebir: Serokê Înstîtuya Kurdî Hasan Kaya  
Beşdar: Zimanzan Feqî Huseyn Sağniç; "Rêzimana Celadet Bedirxan"  
Lêkolîner Felat Dilgeş; "Kesayetîya Celadet Bedirxan a Siyasî"  
Rojnameger Zana Farqînî; "Rojnamegeriya Celadet Bedirxan"

● 19 tîrmeh 1998 yekşem: Konsera hozan Xanemîr, saet:15.00

● 24 tîrmeh 1998 in: Film: Zaroktiya Ivan Derhêner: Andrei Tarkovsky

## ÇALAKIYÊN HEFTEYÎ



Navenda Çanda Alternatîf

● 19 tîrmeh 1998 yekşem: Li ser sistema perwerdehiyê gotûbêj;

Ji Zanîngeha Azad Perwerdekar Dursun Yıldız  
Şanoger-Nivîskar Hüseyn Hilmi Bulunmaz, saet:16.00

● 23 tîrmeh 1998 çarşem: Fîlm:Tabutta Rowaşata Derhêner: Dervîş Zaim,  
saet: 16,00

Li NÇM ya Îzmirê

● 18 tîrmeh 1998 yekşem: Konsera Koma Gulên Xerzan, saet:19.00

● 19 tîrmeh 1998 yekşem: Konsera Koma Gulên Xerzan, saet 15:00

*Li Komeleya Xebatkarên Konfeksiyonan pêşangeh:*

# Wêneyên jiyana hucrekirî



Pêşangeha wênesaz Mehmet Perkitaş. Yekemîn car e ku ew wêneyên xwe pêşkêşî hunerhezan dike.

Wênesaz Mehmet Perkitaş roja 14'ê tîrmehê li Komeleya Karkerên Konfeksiyonê bi navê Jiyana Hucrekirî (Hucreleştirilen Yaşam) pêşangeha xwe ya yekemîn vekir. Wênesazê amator Mehmet Perkitaş bi xwe jî karkerê konfeksiyonê ye. Wî ev wêne di nava salekê de çêkirine.

Wêneyên di pêşangehê de wekî sernavê xwe bi giştî li ser jiyana ku hatiye hucrekirin in. Ligel amatorbûna xwe, mirov dikare bibêje ku hinek wêneyên wî ji aliyê naverokê ve hêjayî nirxandinê ne. Di wêneyên wî de hin kêmasiyên wî yên bingehîn jî hene. Ew dibêje: "Ez xebata xwe bêhtir ji bo ku hunera şoreşê di nav jiyana kesên ku li dijî vê sistemê tédikoşin de bi cih bibe, pêşkêş dikim." Lê di nav wêneyên wî de em leqayî şerê ku li Kurdistanê tê meşandin nehatin. Wênesaz Mehmet Perkitaş jî di vî warê de digel me ye û diyar dike ku, ew dê di demeke kurt de, ji bo ku vê kêmasiya xwe ji holê rake, wê wêneyan li ser şerê ku li Kurdistanê tê meşandin, çêke. Wênesaz, di wêneyên xwe de li ser hucrekirina karkerên fabrîqeyan, hucrekirina gundiyan, hucrekirina ramanê, hucrekirina hunerê û li ser azadiya jinan rawestiyaye. Di gel vê yekê li ser rapêrînên karkeran jî çend wêne saz kirine. Ew xebatên xwe bi boyaxa avî çêdike. Bi rastî wêne ji aliyê mesajdayîna xwe ve têr naverok in.

Bêguman her wênesazekî şoreşger angê

muxalîfekî sistemê wêneyên xwe di mercên zor dijwar de çêdike. Wênesaz Mehmet Perkitaş jî yek ji wan e. Wî jî ev wêne bi giştî di dema vala de ku ji ber karê wî maye, çêkirine. Jixwe dema ku wî dest bi wênesaziyê kiriye tu armanca wî ya xebateke temendirêj nîn bûye. Lê piştî ku mafê wî yê xebatê ji aliyê desthilatdaran ve hatiye bînpêkirin û digel wê beramberî gelek tiştên kirêt maye, armanca xwe li ser hunera şoreşê saz kiriye. Bi vê yekê jî dixwaze ew wekî karkerê konfeksiyonê wêneyên li ser jiyana û xebata karkerên konfeksiyonan û febrîqeyan bi derfetên xwe, lê bi awayekî rasteqînî çêbike û pêşkêş bike.


Dîsa li gorî wî, armanca wî ew e ku hunera şoreşê di nav çîna karkeran de berfirehtir bibe. Her wiha wênesaz bi pey agahiyên xwe diyar dike ku, dîsa armanca van wêneyan heye ku karkeran ji wê çanda pûç rizgar bike û hunera şoreşê bi wan bide nasîn. Wênesaz wekî dawî ji bo me daxuyand ku, huner divê ji metayê wir de pêşengiyê bike. Divê hin tiştên bingehîn bide mirovan. Dema nede ew dê ji hunerbûna xwe derkeve, bibe wekî metayekê. Pêwîst e huner li ser tengasiya gel li ser qetlîaman û li ser şerê kirêt ku tê meşandin raweste û em jî van yekan bi riya wêneyan pêşkêş bikin."

Pêşangeha wêneyan a Mehmet Perkitaş wê heya demeke dirêj ji bo wênehezaran vekirî be.

A. WELAT/STENBOL

## TÎŞK

### Raportî Koç



#### BEKÎR ŞIWANÎ

Encûmanî Perlemantaranî Konsey Ewropa, rojî 25/6, raportêkî be nawnîşanî "Barî Mirovayetî Penaberan û Koçkirdiwekanî Başûrî Rojhelatî Tirkîye û Bakûrî Iraqî" xiste ber bas û lêkolînewe û heman roj, raporteke pesend kira û berz kirayewe bo encûmenî wezîranî Ewropa. Em raporte berhemî çend lêkolîneweyek û karî bêwiçanî perlemantari sosyalîstî Swîsrayî xatûn Mangold bû. Em xanîme lomelê pêşniyarî be cêy xizandibiwe raportekeyewe. Lewane: Bestinî konfransêkî nêwdewletî bo çareserkirdinî kêşey kurd û girtinberî rêy diyalog bo çareserkirdinî kêşeke û dawa le Partî Kirakaranî Kurdistan PKK û dewletî tirk bikrê agirbestêkî dû layene rabigeyenin.

Belam layenî turkî maweyek bû xoy melas dabû bo ewey nehêlê raporteke wekû ke heye le layen Encûmenî Perlemantaranî Konsey Ewropa we pesend bikrê. Diway giftûgo û demeteqeyekî germ û dest tewardanî perlemantarekanî tirk û perlemantare Ewropiye parêzgarekan, ew pêşniyarane raportekey xatûn Mangold labran û bem şeweye darêjranewe: Le cêy bestinî konfransêkî nêwdewletî bo baskirdinî kêşey kurd, le encûmeneke da danîştinêkî taybet bew babete encam bidrê û le ciyatî bekarhênanî diyalog bo çareserkirdinî kêşey kurd, destewajey girtineberî rêy naserbazî bo çareserkirdinê kêşeke bekar hênra.

Herweha le ser daxwazî layenî turkî, wişey kurd le raporteke derhênra û zaraway hemwelatî tirkû be reçek kurd xiraye cêy. Belam sereray hemû ew gorankariyane, giftûgokirdin le ser raportêkî taybet be barî mirovayetî penaberan û koçkirdiwanî bakûr û başûrî Kurdistan û le dezgayekî wekû encûmenî perlemantaranî Ewropa da, be destkewtêkî gewre dadenrê bo gelî kurd û kêşe rewakey. Eger dîplomasiyeyê kurdî gur be xoy bidat û le astî pêşkewtinekanî cihan da bê, ewa dekrê destkewtî gewretirîş be dest bixrê.

Raportekey xatûn Mangold seray gorîn û deskarîkirdinî, hêşt çend dawayekî girîng le xo degrê. Lewane: Dawakirdin le supay tirk bo dest helgirtin le sûtandin û çolkirdinî gundekanî Kurdistan. Diwayî hênan be hêrîş û pelamarî serbazî bo ser başûrî Kurdistan. Helweşandinewey sistemî çayayetî û herê barî awerte û herweha gitneberî rêy dûr le şewazî serbazî bo çareserkirdinî kêşey kurd.

Helbet çawdêr nabê ewe feramoş bikat ke Ewropa lem kate nasik û hestiyare da, hewl deda hawkêşeke hawseng rabigrê û hem Tirkîye razû bikat û hem peyamî gerim arastey layenî kurdî bikat. Wek dezanrê le kobûnewey encûmenî wezîranî Yekêti Ewropa ke kotayî salî rabirdû le Luksembûrg bestra, Tirkîye le listey frawanbûnewey Yekêti Ewropa da nawnûs nekira, diway eweş perlemanî Ferensaş yasay taybet be komelkûştinî Ermeniyekanî pesend kird, Ankara hêndey tir tengaw bû. Boye Ewropa dîsanewe penay birdewe ber siyasetî kurd witenî (ne şîş bisûtê û ne kebab) û raportî taybet be kêşek kurd le qalibêkî tir da darêjrayewe.



## ZAROKÊN HÊJA;

Hûn dizanin em vê rûpelê ji du hefteyan carekê ji we re vediqetînin. Di yarîgeha we de em berhemên ku we ji me re şandine diweşînin û pêşkêşî we dikin. Berî vê hefteyê di vê rûpela we de me bi çavên zarokekê nivîsa seyrangeha zarokan weşand. Em dixwazin hûn jî der heqê yarîgeha xwe de rexne û pêşniyazên xwe û her wiha berhemên xwe ji me re bişînin. Bi vê mebestê ger hûn bi me re bikevin têkiliyê emê pir kêfxweş bibin. Em dixwazin hûn bibin ka hûn niha bi çi re eleqedar dibin û dixwazin çi karî bikin. Ger hûn ji vê bêhnvedana xwe ya dibistanan beşekî ji wextê xwe ji me re veqetînin, emê kêfxweş bibin. Em li benda name, faks û telefonên we ne.

Heta careke din bimînin di xweşiyê de.

Hevala we RÛBAR



## LÎSTIK

## Pirpitî

Ha pirpitî, pirpitî  
Kilê çavê reş pitî  
Apê Bro çi tîne  
Her barik mewîj tîne  
Keçik çûne nêçirê

Xezal kuştî bê tîrê  
Xezala me hêla bû  
Dest û pêçik şivak bû  
Şivaka nav zêrîn e  
Binê dara zeytûnê  
Kesk û sor û zer  
Ellah û ekber



## Ç Î V A N O K

- Heşt hirç her heşt hirç navmil bi pirç
- Kera boz li rizdê zirya
- Ez çûm mera mala Mele Remezan min got ka mera mala Mele Remezan, got mera mala Mele Remezan çûye merdanê
- Bi niga çûm gû, bi desta çûm mû, bi deva çûm tû

## Berfîn û Remocan

Hevatî ez Bêrfîn  
Çiya ji me re dikenin  
Em bûn şivanê miyan  
Kulîlkê dilê dêyan  
Me pir ji hev hes dikir  
Rengê çiya geş dikir  
Em bibûn panzdeh salî  
Axê em ji hev dan alî  
Bêrfîn qîza axa ye  
Xwediyê milk û baxa ye  
Axê got te didim mêr

Ser binê xwe bike zêr  
Bêrfîn got mêran nakim  
Ezê xwe û te azad kim  
Axê got azad çi ye?  
ma kî ji we birçî ye  
Bêrfîn got va Remocan  
Mal de nîn e qetek nan  
Axê got me jê çi ye?  
Feqîr kolê dinê ye

Remo û Bêrfîn çûn çiya  
Ketin nav keriyê miyan  
Pezê axê firotin  
Xwîn ji laşê wî dotin  
Giş kirin pere û zêr  
Gotin emê bikin xêr  
Bûn mêvanê hevalan  
Wek du karê xezalan  
Ketin şahî û dîlanê

Ji bo evîna jiyane  
Du salên wan tamam bûn  
Axa ji wan bê guman bû  
Axêna wî bibûz pez  
Axê bê we nemînim ez  
Piştî du sal û nîvan  
Çûn gund Bêrfîn û Remocan  
Mala axê bûn mêvan  
Aqil, raman dane wan  
Xatir xwestin ji dayikên xwe  
Rabûn ketin riyên xwe.

RAMAN ÇAKIR



## Yek ji awarteyên mûzika kurdî:

Dema ku Ahmet Altan, li ser Ciwan Haco nivîsibû, gelekî bala kurdan kişandibû. Di vê nivîsê de Altan, bi taybetî pesna strana "Ziravê" dabû. Li aliyê din di nav guhdarên Kurdistanî de jî cihê vê goraniyê (stranê) taybet e. Lê mixabin kêma kes pê dizanin ku, afirînerê vê goraniyê Miradko ye. Miradko ango Muradê Kinê hem bi naveroka mûzika xwe, hem jî bi şewaza (terz) mûzika xwe cihereg e. Balkêş e, gelek hunermendên Kurdistanî yên wekî Ciwan Haco, Aramê Tigran, Miradko wekî şarezatîrîn hunermendê Kurdistanî bi nav dikin. Her wiha gelek rewşenbîrên Kurdistanê jî digel vê baweriyê ne. Bo nimûne, Şerefxan Cizîrî li ser Miradko wiha dibêje: "Deng li Kurdistanê wekî dengê Miradê Kinê hîna jî weyda nebûye." Tevî vê yekê balkêş e, heya niha kasetên Miradko bi şeweyekî nûjen nehatine tomakirin. Dema mirov li naveroka stranên Miradko temaşe dike, sedemên navdarnebûna wî hinekî berbiçav dibin. Lewre gotinên stranên, li dab û nêritên civaka feodal û misilman nayên. Ev hunermend li Kurdistanê wekî mitîrbîrên binavkirin. Di vê navlêkirinê de biçûkdîtî li dar e. Dîsa jî Miradko û dûvajoyên wî li hin herêman bi nav û deng in. Digel dijberiya civak û dewletê wan dest ji şewaz û hunera xwe nekişandine. Helwesteke anarşistiyane meşandine. Ev diyarde jî hêjayî lêkolandinê ye. Her wiha di nav aşûrî û gelên din yên Kurdistanî de jî gelekî qedrê Miradko tê girtin.

Li aliyê din helwesta hin derdorên kurdan jî li ber navdarbûna Miradko û dûvajoyên wî bûye berband. Mûzika Miradko û hevrêyên wî, wekî paşverûti hatiyê binavkirin. Lê balkêş e, rayedarên Tirkîyeyê jî berê xwe ji kesên bi vî rengî banedaye û bo van kesan biryara qedexebûnê rakirîye. Bi pey ragihandina hin kesan, Miradko bi jehrdana rayedarên Tirkîyeyê hatiyê kuştin. Serpêhatiya Huseynkê Omerî, ku yek ji dûvajoyên Miradko ye, kêma û zêde wekî Miradko ye. Huseynkê Omerî piştî sonda deh salan kete tomargehê (stûdyo) û bi navê "Cizîra Botan" kasetek tomar kir. Kaset jî aliyê Mazlum Kasetçilikê ve hatiyê çêkirin. Di kasetê de ev stran cih digirin: Cizîra Botan, Nofa, Emo Musê, Ew jî Ji-

# Huseynkê Omerî

na, Cîranê, Şînokê, Dilo, Tembûra Dilê Min, Çav Xezal, Werin Sêva, Xeftano, Xanimê, Xurfanî. Huseynkê Omerî, her çiqas bi siyaseta ranebûyê jî desthilatdarên Tirkîyeyê bela xwe jê venekirine. Di sala 1971'ê de ji ber ku di "Şevbûhêrka Rojhilatîyan" de stiriye, du sal cezayê hepsê lê hatiyê birîn. Omerî peyre berê xwe dide Edeneyê. Lê ji ber ku polis li dawetekê hemû amûrên wî tarûmar dikin, dest ji karûbarê mûzîkê dişo û li dora deh salan bi karê mûzîkê ranabe.

Stranên di vê kasetê de ne, heya dawiyê mirov direqîsin. Huseynkê Omerî di stranên xwe de, ji bo çareya serê

xwe hildikişê cem Makarios, çêran li dê û bavên keçikan û li sofîyan dike, dibe bengiyê memikan û bo Aşokê wisa dibêje: *Por bi rişk e weka kejiya bizina!...Ma Aşo jina...Diranê wê weka firşikê yapraxan*

Li aliyê din hin amûrên ku hatine bikaranîn, reseniya mûzîkê kêma kirine. Bo nimûne mey û ney hatine lêdan lê kemenceyê (ribab) jî xwe re cih nedatiye. Digel vê kêmasiyê, dîsa tevî ku kaset bi kurdî ye jî, jînenîgariya Huseynkê Omerî bi tirkî hatiyê nivîsin.

Bêguman Huseynkê Omerî di karê xwe de bi qasî Miradko ne şareza ye. Lê mirov dikare di warê şewaz (terz) û zengelûra (girtlak) orjînal a kurdewarî de sude jê wergire. Ew şewaz ku bi Miradko te nasin, di mûzîka kurdî de jî bîlî Ciwan Haco zêde nehatiye berbiçavkirin. Van kesan piranî bi stranên reqsê ango dilokan nav û deng dane.


Dîsa di warê zengelûra kurdewarî de hunermendên nûhatî divê li van hunermendan guhdarî bikin. Ji ber ku dengê van kesan rafîne ye û terkemilî ye. Ji ber vê yekê digel hin kêmasiyan mirov nikare mûzîka van hunermendan ji binî ve di ser guhê xwe re biavêje. Her wiha van kesan stran avêtine ser şer û camêriyê jî. Bo nimûne Miradko stran avêtine ser Şêx Sêid jî.

MAZLÛM EŞREF



## Evîn behr e

HASAN KAYA



Ku evîn nebe, kî û çî dikare mirov li ser piyan bihêle. Di vê cihana ku bayê êş û keseran mîna şûrekî rûyê mirov dibirê de, xweragirtina li hemberî mîrê xerabiyê, helwesteke zor dijwar e. Derûdora me, çoleke ku ji bêkamîyê (bêmiradiyê) tê pê ye. Em bi rewşa xwe ne razî ne û li hemberî çarenûsa xwe ya bêdad radibin. Em bi çolê, bi êş û keseran, bi mîrê xerabiyê, bi rewşa xwe ya gelco melco û bi çarenûsa bêdad ne qayîl in. Evîn û hêviya me, li hemberî ev qas astengîyan me diparêze, li ser piyan dihêle.

Yek deqîqeyê, yek keliyê em bê-evîn, bêhêvî bimînin, rûyê me dê zer, dilê me dê bêtaqet, çavên me dê bêronahî bimînin. Wê demê piyên me dê nikaribin lês hilgirin. Beden dê bibe komek goşt û hestî. Me ev mîrat, ji bav û kalên xwe wergirtiye. Ev xususiyet a hemû mirovahiyê ye. Di nav her gelî de, çîroka evîneke bi şewat a ku dû jê li ba dibe, heye. Hêza ku çiyayê bêstûn, bi

Ferhat daye qulkirin, a di dilê Zînê de, ya Leylê û Mecnûn, a Hawariyên Îsa, ya Melayê Cizîrî çî ye? Gelo zêrker û gewherşinasên kîjan demê, dikarin evîna Melayê Cizîrî binasin? Evîna wî xwedayî ye, mirovayî ye, welatî ye an yekûna van hemûyan e? Dibe ku ji yekûna van hemûyan zêdetir be jî. Evîneke wiha bi vî rengî bûye. Lewre dibêjin, jinekê çûye, nanê xwe bi lata ku Melê pišta xwe didayê û şîr dixwendin ve daye û nanê wê di cih de pijiyaye. Di vê meselokê de, ez bawer im tiştê ku tê xwestin, kifşkirina enerjîya evînê ye. Ango nanê hermetê bi dengê enerjîya evîna Melê hatiyê pehtin.

Her çiqas gelek şair, hozan û wêjevanan gilî û gazincên xwe ji evînê kiribin jî, ew tu caran bê-evîn nekarîne bijîn. Dema ku hozan dibêje "Evîna te ez pîr kirim" gelo meqseta wî çî ye? Evînê ew kal kiriye an ew gihandiye, bi pêş ve biriye û gihandiye radeya "pîr" îtiye? Dema ku Seydayê dilziz gotiye "evîn behr e, lewre tenê bi ber pêlan ketim..." gilî û gazincên xwe ji evînê kirine, tu dilêşiya wî ji ber behr û pêlan heye an na? Ez dibêjim wî ços û hêzeke xurt jî pêlên deryayê wergirtiye. Jixwe tenêbûn jî, jê re hîç xem nebûye. Heta ji ber ku di nav deryaya evînê de bi tena serê xwe avjenî kiriye, bêtir stewiyaye, kamil bûye û heke evîn dil be, an jî sêveke sor be, ez

dikarim bibêjim ku sêva di hundirê Cegerxwîn û ya hemû wêjevanan, (lewre wêjevan ehlê dil in) de, bes bi pêlên jiyane yên xedar dikare bigihe û sor bibe. Ma ji ber vê yekê nîn e ku dibêjin; "fanûsa dilê wêjevan nazik e.?" Loma jî zû dişikê, lê cebirandina fanûsa dil gelek zehmet e. Ev dil, her çendî nazik be jî, enerjîya evînê, wî li hemberî ev qas kirinê qirne 21. yên neçê li ser piyan dihêle.

Serdestên îroyîn cihan kirine ting û sergo. Mirov nikare derkeve kolanên bajarên. Dîmenên mirovan ên xerab, birçîtî, tazîtî, fuhûş, dizî, pevçûn û hwd. Ji hemû ajansan xwîn, xela, şer û pêşbazîya zengîntiyê guhê mirov diqulqulîne. Jixwe li welatê me rewş hêj xerabtir e. Bi gumana min, ehlê dil ên berê, ji bo ku tiştê xerab ên dema xwe nebînin, çûne di şkeftan de jiyane. Xwe ji mirovan dûr xistine. Bi tena serê xwe jiyane. Lê dîsa jî bi êş û kulên civaka xwe re jiyane. Ango ji mirovan dûr in, lê mirov di nava xwe de dane jiyandin.

Em jî îro mecbûr in ku, di nav mirovan de bijîn, mirov di nava dilê me de bijîn. Û heke navê neheqiyên dema me pêlên behrê bin, em jî dilê xwe bistewînin bi pêlên behrê. "Evîn behr e, em hemû bi ber pêlan ketine."



# Şêx teqîsî û Fesla gundê Êsê

**Ê**sê gundekî bi ser Kercewsê ve ye. Gundekî pir xebatkar û kedkar e. Lê belê li gorî vê demê gelek li paş maye. Salê 12 mehan dixebitin, ku dibe payiz, pev dikevin û serê hev dikin. Mêrekî dudu ji hev dikujin û hinek dimirin, hinek dikevin hepsê û hinek ji wan derdikevin serê çiya, dibin mehkûm. Keda xwe ya salekê dibin didin qereqola dijmin û ya ku dimînê ji didin şêxên ku tene fesla wan, ji bo ku wan li hev binin. Lê belê her sal ev mesela wan dubare dibe.

Rojekê hinek diçin li ba şêx dibêjin: "Şêxê min, Ez bi qurban! Tu werî nav Gundê Êsê wan li hev binî." Şêxê mezin bi xwe re nabîne ku here wir, Şêx Sitqî û çend sofîyan dişîne gund. Kela navê rojê, şêx xwe digihî-nê gund û diçin mala axayê gund. Hala havînê ku li ber ban çêkiriye, li ber siya holê balgîv û nazbalgîvan davêjin ser hev û şêx xwe davêje erdê. Navrojê amade dikin, şêx û sofî dikevin ser, zikê xwe têr dikin. Şêx ji axa re dibêje: "Axa, gazî millet bike, bila tev werin, em di nav wan de biaxivin, darekî di nav wan de deynin û wan li hev binin, divê em sibehî zû herin." Axa gazî yekî gundî dike, dibêje: "Lawo zû! Derkeve ser xaniyê qesrê û bang li hemû gundiyan bike, bila werin Şêx hatiye fesla me". Gundî hildikişê ser xênî û bi dengeke bilind gazî dikê: "Hey

hê gelî gundiyan! Hûn tev li nav dehl û rezê xwe ne, hûn dengê min dibihî-zin, Şêx Mûqsî hatiye fesla me, ku me li hev bine, ji bo vê yekê bila tev gundî werin, we te-van dengê min bi-hîst, ên ku nayên ez nizanîm çî ye Şêx bixwin."

Şêx ji axa re dibêje: "Ev çî eh-meqî ye? Wî em herimandin kuro! Dibêjê min Muqsî, kuro navê min Sit-qî ye!". Axa bi dengeke bilind ga-zî mirovê xwe di-ke: "Kuro lawo! Te navê şex şaş got, navê şêxê min Şêx Qestî ye, bêje Şêx Qestî". Careke din bi dengeke bilind mirovê axa gazî dike: "Gundîno! Min navê ez qurban Şêx şaş pêşkes kiriye, navê Şêx, Şêx Teqîsî ye". Şêx bala xwe didê ku, Mûqsî bû Qestî, Qestî jî bû Teqîsî, dibêje: "Wele ez tev bi-



dim wê xirabtir bikin" û hema dengê xwe dibire. Gundî yek dudu ber bi mala axa ve tîn. Ê ku ewilî tîn ji Şêx re dibêjin: "Wey wey Şêxikê mino, ez qurbano, çav reşiko, çav xwe-şiko, çav şeytano!" û diçe rûdine. Mirovekî ku çend qalikê petêxa bi ber sînga xwe ve girtiye, dema tê li ber Şêx, yeko ye-ko berdide erdê û dibêje: "Şêxê min! Tu van çend qalikên petêxan bikoje, heya ez destê xwe bişom, ez ê werim tewafa Şêxê xwe." Mirovekî din ku mîşas di destê wî de ye, ji dût ve mîsase diavêje ber Şêx û dibêje: "Şêxê min! Çima tu li ber siya holê rûnanî, yên me mala me xira bû, di van dehlan de ji german em peritîm, te xwe li ber siya holê belot kiriye, bayê

hênik li devê şalê te dixê, ma xema te ye?" û zexçek diniçînê û lê vedigerîne: "Şêxê min! Tu di vir de bi xêr hatî". Bi niça niç, Şêx ji axa re dibêje: "Kuro malmîrat! Qet te terbiye nedayê van gundiyan xwe." Axa jê re dibêje: "Şêxê min! Bihna xwe fireh bike. Tu bi vî xulqê û serê teng nikarî gundiyan li hev binî". Şêx mêze dike ku axa ji wan ên din xirabtir e, dengê xwe hêdî hêdî kêmbê dike.

Serê sibê bi qehra êvarê karê xwe dikin ku vegerin malê. Axa jî berî ku şêx û sofî-yên wî herin, ji wan re taştê amade dike. Li ser sifre hekê qelandî, mast, şîr, hingiv û penêr datîne. Şêx vê sifreyê dewlemend didê ber pariyan. Jimeke ku zarokê wê li hembê-za wê ye dikeve hundir, bi hêdîka nêzîkê Şêx dibe, wî tewaf dike û dibêje: "Şêxê min! Zarokê min nexweş e, ez qurban tu jê re nivîstekê çêke û li ser bixwîne, belkî baş bibe." Şêx dibêje: "Derdê wî çî ye, ku dera wî diêşe?" Jinikê lê vedigerîne: "Wele qur-ban! Ez jî nizanîm. Hema gûkê wî wekî wan hêkê li ber te zer dike." Şêx aciz dibe û bang li axa dike: "Kuro! Hespê min binin. Bi serê bavê min, di vî gelî de hûn hev du biqelînin jî, ez hew tîm fesla we."

Berhevkar: OSMAN AKDAĞ

## BI XELAT... XAÇEPIRSA BI XELAT (129) XAÇEPIRSA

E	N	C	A	M	K	E	S	E	N
V	A	N	N	O	K	E	R	T	S
B	E	N	N	A	M	R	T	S	
A	P	E	S	T	N	K	E	M	
O	A	T	A	S					
A	L	A	N	E	V	P			
A	N	T	N	T	K				
E	T	K	E	X	E				

PEYVA VEŞARÎ

Kird Şehidek	Dengdare n "Bederê" Nasandin	Paşgîrek	6	Pistî	Tipeke Kurdi Navekî Jinan	5	Paytexta Albanyayê		
S	I	D	7D	I	K	T	A	N	Wekî Fena
Sirûd				Îstikrar	Bi dimilî "wan"	3			
Dijberê "ser"			Tûrê pereyan	Dijberê "ran"			Amûreke muzikê		
1									
Zinar				Keriyê dewaran		Jir, alim		9	
Sembola Oksijenê						% 50			
	Navekî Mêran Ez...						Xwarineke bingehin Faşistên almanî		
Hatirat Rêxistina Niviskaran									
Qetek. Perçebûn		Tîpa piştî "s" yê					Tîpa dawîn		

**Bersiva Xaçepirsa 127'an**

Xaçepirsa me bi xelat e. Di 15 rojan de çî bersiv bigihîjin destê me, emê wan binixînin û bi rîya pişkê li 5 kesên belav bikin. Xelata hej-mara me ya 129'an kasete Huseynkê Omerî 'Cizîra Botan' e.

**Jêrenot:**  
Ji bo ku bersiva we bê nîrxandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî navnîşana xwe ji me re bişînin.

**HUSEYNOMER**

**cizîra bot**

Pênc kesên ku xelata hejmarê 127'an pirtûka Selîm 'Yûsiv û Zuleyxa qezenc kirine: Hakan Önür/ Semsûr, Süleyman Açıy/ Midyad, Zelal Baz/ Elbîstan, Şahanîm Rûbar/ Sêwaz, Zinar Çiya/ Silêmanî.

PEYVA VEŞARÎ

1 2 3 4 5 6 7 7 9



# Fermandaranê ARGK pêsermayîn de biryar da Vardayinê gerîlayan benê vêşî

Gerîlayanê ARGK nê rojanê peyinan de vardayinê xo kerdî vêşî. Hem bakur û hem jî başûrê Kurdistanî de vardayinê girdî virastî. Vardayinan de xeylê eskerî û xeylê jî pêşmergeyê PDK kişyay û xeylê jî bî dirbetinî.

La belê gerîlayanê ARGK 14'ê meng de winî jew vardayin virast ke vaten ke ca de bo rojnameyê û televîzyonê tirk hewn ra werzaynay. Rewna wo rojnameyan û televîzyonanê tirk çöşmeyê şerê psikolojîkî de qe ca nêdayê vardayinanê ARGK. La belê vardayinê 4'ê meng hemû televîzyonan xeberanê xo de kerd xebera verîn, rojnameyan jî manşet ra dê.

Kesî ke vardayin televîzyonan ra temaşe kerdê, vatenanê televîzyonan ra kesî vatê qayê çehar panj mengî yo vardayinê nêviraziyenê û na vardayin kotî ra vejîyê. Rastî wexto ke xo xeberî dayê vatê rewnawo PKK nêşayê vardayin virazo nika xo heveyê arêkard eke verê ci megeyriyo vardayinî niwa tepya benê vêşî.

Rastî kes ke nê xeberan goşdameno wiyateyê kesî yeno. Çimkî çiyê ke iyê vanê, iyê xo jî bawer nêkenê. La belê iyê çöşmeyê şerê psikolojîkî de ci ra çiyê vajiyeno iyê anê ca. Vardayinê her roj benê û viraziyenê. Esker, cahş û pêşmergeyê her roj kişyenê. Gerîlayê ARGK'yê her roj vardayinî virazenê û nê vardayinan de hend eskerê kişyenê ke, mayê kotî ra ravêremî meyitê eskerê kişyayî û kişyayanê vejîyenê ma ver. Her roj jû tax yan jî jû dewa Anatoliya de meyitê eskeranê kişyayanê hewadiyenê. Ma iyê nînan qe nêvînenê? Bêguman iyê ma ra rind vînenê. La belê iyê rind zanê, ek ca bidiyo hemû eskeranê kişyayan û dirbetin biyayan. Ne kes qeçanê (domananê) xo rêseno eskeriye û ne jî kes xo şino eskeriye.

Gama ke wina biyayin de na fin nêşenê şerî zey wastena xo û zey wastena girdanê xo biramê. Coka ca nêdayê vardayinanê ARGK. Ze ke yeno zanayin verî rojnameyan û televîzyonanê tirkan meyitê eskeranê kişyayan û malbatanê kişyayan xeberanê xo de zaf zaf ca dayê ci û wastê meyitanê eskeranê kişyayan şovenizm berz kirê. Şarê kurd û tirk dişmenê pê kirê.

La belê nê rojanê peyinan de vardayinê gerîlayan bî vêşî. Vardayinê gerîlayan vêşîbiyayin de jî bêguman amorê

eskeranê kişyayanê jî beno vêşî. Jew niyo, didî niyo meyitanê nînan bimusnê şarî û fikirê şovenizm berz kirê. Ezo wazena tiya dîrok, cayê pêrodayinî û peyniya ci binûsnî

**11'ê Tîrmeh Dara Hênî:** Eskerê tirk kewtî kemîna gerîlayanê ARGK; 2 eskerî merdî, 1 esker bî dirbetin.

**Hênê:** Mabenê gerîlayan û ARGK de pêrodayin vejya; pêrodayin de 2 eskerî kişyay, 3 eskerî bî dirbetinî.

**Elbak û Gever:** Mayino ke gerîlayanê ARGK tebritbi teqa; jewê ci esker, 2 kesî merdî, 2 kesî bî dirbetinî.

**Amed û Çewlik:** Mabenê gerîlayan û eskerê tirk de pêrodayin vejîya, xebera ke hetanî nika kewt me dest 8 eskerî hewadiyay nêweşxaneyê eskeriye Amedî.

**Dewa Silivanî Girçela:** Dewa cahşana, gerîlayan vardayin virast; 4 cahşî



yay.

## 12'ê Tîrmeh

Dêrsim: Mayino ke gerîlayan tebrit-



Cayê vardayinê peynî ê ARGK, îstasyona radyolink a PTT'ya Geverê.

kiştî, 4 kerdî dirbetinî.

**Sîdeka:** (başûrê Kurdistanî) Gerîlayan ARGK pêşmergeyanê PDK rê vardayin virast; 29 pêşmergey kişyay, xeylê bî dirbetinî û çend heb jî erebeyê PDK jî vardiyinî de xerpinayî, jew jî gerîla bî dirbetinî.

**Fermangeha PDK ya Sîpahi:** Gerîlayan vardayin viras; 5 Pêşmergey kiş-

bi teqa; 7 eskerî bî dirbetinî û eskerê ke amey nînan rê hetkarîn bikirê kewtî faqa gerîlayan; 3 eskerî merdê, 2 eskerî bî dirbetinî.

## 13'ê Tîrmeh:

Zêrza (aşûrê Kurdistanî) Eskerê tirkê ke wija geyrayê mayin pay kerd û 2 eskerî merdî.

**Sêrt-Şirnex-Wan:** Pêrodayinê ke mabenê gerîlayan û eskeranê tirk de vejyay xeylê eskerî kişyayê, xeylê biyê dirbetinî.

## 14'ê Tîrmeh:

**Botan:** Vardayino ke gerîlayan eskeranê tirk û pêşmergeyanê PDK rê virastê vardayinî de 12 eskerî û 14 jî pêşmergey kişyay.

**Şax:** Mabenê gerîlayanê ARGK û eskerê tirk de pêrodayin vejîya 8 eskerî kişyay. Hênî: Gerîlayan vardayin virast; 9 eskerî û jew jî tîmo taybet kişîya.

Birbizina (başûrê Kurdistanê) Gerîlayan vardayin virast, xeberê ke hetanî nika kewtî ma dest 12 eskerî û jew jî persbenoyê PDK kişîya. Nê hemû vardayinan de gerîlayanê ARGK dest na xeylê çinayay û hacetê şerî ser û xeylê jî hacetê şerî xerpina.

**Ancî 14'ê Tîrmeh:** Dewa Gever a Colemêrgî Silvana (Kamışlı): Gerîlayan vardayin virast; 10 eskerî û 7 cahşî kişyay 9 eskerî û 4 cahşî jî bî dirbetinî.

Gerîlayanê ARGK 14'ê meng de winî jew vardayin virast ke vaten ke ca de bo rojnameyê û televîzyonê tirk hewn ra werzaynay. Rewna wo rojnameyan û televîzyonanê tirk çöşmeyê şerê psikolojîkî de qe ca nêdayê vardayinanê ARGK. La belê vardayinê 14'ê meng hemû televîzyonan xeberanê xo de kerd xebera verîn, rojnameyan jî manşet ra dê.

MABENDÊ VENĞÛVAZAN

**WELAT**  
ROJNAMEYA HEFTEYÎ  
(Haftalık Gazete)

■ Xwedî (İmtiyaz Sahibi)  
M. NURİ KARAKOYUN

■ Yönetim Yeri  
İstiklal cad. Asmalı Mescit sok. 35/37 No:308

Beyoğlu/İstanbul  
TEL: (0 212)  
251 79 37-251 90 13  
FAX: 251 95 85

■ Gerinendeyê Giştî yê Weşanê  
(Genel Yayın Yönetmeni)  
SAMİ TAN  
■ Berpîrsê Karên Nivîsaran  
(Yazı İşleri Müdürü)

M. SALİH TAŞKESEN  
■ ÇAPXANE  
Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.  
■ Yayın Koordinasyon:  
Gündem Basın ve Yayıncılık San. Tic. Ltd. Şti.

■ BELAVKIRIN  
BIRYAY Dağıtım  
■ NÜNERİTİYÊN ME  
(Temsilciliklerimiz)

■ Mersin  
Tel: 0 (324) 233 83 96

■ İzmir  
Tel: 0 (232) 425 37 02  
München:  
(Nünerê Giştî yê Ewropayê)  
Mahmut Gergerli  
Tel: 49 871 672 29  
Fax: 49 871 670 815

■ Swisre:  
Ihsan Kurt  
Tel-fax  
41 21 652 76 07  
■ Hollanda:  
S. A. Fewzi  
31 104 85 55 43  
■ Suriye:  
Jana Seyda  
Helim Yüsi



# Mamosteyê şano û mûzîkê yê Yewnani Karalîs Lakîs: Hunerê bi mirovatiyê re dest pê kiriye

Şano bi jîyanê re dest pê kiriye. Ez nikarim bibêjim teqez şano cara yekemîn li vir an li wir, li vî welatî yan jî li wî welatî dest pê kiriye. Belkî hinek ji cureyên şanoyê li hinek welatan pêşkêşîr bin, lê jîyan bi xwe şano û huner e, heger li deverekê jîyan hebûbe, li wir jîyan jî şano jî hebûye.

## Huner çi ye?

□ Huner hest e, tiştêkî ku mirov pê dijî ye, ez jî hewl didim ku bikevim nava vê jiyana hunerê, lê bi awayekî teqez (kesin) ez nikarim bibêjim huner çi ye. Huner rêgeha jîyanê ye, ez nabêjim huner bes teatr, muzîk û yên din in. Huner rêgeha jîyanê ye.

**Hinek dibêjin ku şanoyê li Yewnanîstanê bi riya dêran dest pê kiriye û hinek îdia dikin ku şanoyê cara yekem li Mezopotamya dest pê kiriye, a rastî li ku dest pê kiriye?**

□ Şanoyê bi jîyanê re dest pê kiriye. Ez nikarim bibêjim teqez şanoyê cara yekemîn li vir an li wir, li vî welatî yan jî li wî welatî dest pê kiriye.

Belkî hinek ji cureyên şanoyê li hinek welatan pêşkêşîr bin, lê jîyan bi xwe şano û huner e, heger li deverekê jîyan hebûbe, li wir jîyan jî şano jî hebûye. Ango huner bi mirovahiyê re dest pê kiriye.

**Bi rastî şano çi ye? Amûreke ku jiyana mirovan perwerde dike, mirovan nûjen û bi pêş ve dibe ye?**

□ Divêt em bizanibin ku çelî çi celeb şanoyê tê kirin; şanoya kevnar a yewnani, şanoya japonî yan cureyên din.

Belê, şano amûreke e ji mirovan re ku ew bikaribin bi hev re bijîn, bi hev re bimeşin, ji ber ku şano hêzeke ronahî ye û ez bi şanoyê zêde diperesim.

**Ma mirov nikarin bêyî şanoyê bijîn?**

□ Ez bawer nakim. Rojana jiyana me şano ye. Niha em dibêjin 'beyanî baş', 'roj baş', 'çawan î?' Xweş e, lê belê dema bi awayekî şanoyî were gotin xweştir dibe.

**Baş e, ma şano tiştên ne baş jî fêrî mirovan, fêrî civakê nake?**

□ Belê, belê dike. Ji ber ku şano hêzdar e, şano dikare tiştên ne baş jî fêrî civakê bike, dikare mirovan tûşî nav tiştên xerab bike. Şano jî fikrên wê hene, şano-

ya fikir-rast tiştên baş û rast pişani civakê dike, şanoya fikir-xerab jî; wekî mamosteyekî xerab e.

**Tu yê der barê şano û filmên Amerîkanî de çi şîroveyê ji me re bikî?**

□ Armanca şîrketên film ên Amerîkanî ya yekemîn bazirganî ye. A wan huner duyem armanç e, yekem pere ye. Ez dikarim bibêjim ku dîroka huneran her wiha bûye. Amerîka bazirganiyeke mezin di warê film de dike. Wekî mînak ez dikarim bibêjim ku ji sedî not (%90) li Yunanîstanê filmên Amerîkanî derdiçin.

**Hinek aktor û hunermend dibêjin ku 'filmên Amerîkanî ehlaqê civakê xerab dikin, mirovan tûşî nava tiştên xerab dikin û hinek ji filmên amerîkanî jî terorîstîk in; mirovan fêrî terorîzmê di-**

□ Ez hunera kurdan zaf kêr dinasim lê di mûzîka kurdî de ez hinek tiştan dizanim. Muzîka kurdî pir orjînal e, muzîka rojhilatî ye. Ez ji muzîka kurdî pir hez dikim, lê mixabin ez pir kêr dinasim.

**Hinek hunermend îdia dikin ku pandomîm li Mezopotamya derketiye holê, rast e?**

□ Gengaz e, dema mirov li rojhilatiyan dinêre pir bedena xwe dilivînin, pir dest û lingên xwe dilivînin. Dema distîrên jî bedena xwe pir bi kar ûnin.

**Pandomîm bingeha şanoyê ye, yan ew du tiştên jî hev cuda ne?**

□ Pandomîm tiştêkî din e, cuda ye. Dema em dibêjin pandomîm, ez der barê pandomîma Ewropiyan diaxivim. Ez



Xwendekarên Karalîs Lakîs Li Kampa Lawrion di xebatekê de tîn dîtin.

**kin. Wiha ye?**

□ Rast e. Hew çend ez xort bûm jî, ez carinan di bin bandora filmên Amerîkanî de dimam. Mînak filmên "Kovboy" Îdeolojîyek in, di mêjiyê zarokan decih digirin.


Di filmên Amerîkanî de tê dîtin ku mirovan dikujin, derdora tarûmar dikin, dişewitînin, şer û ceng e; ev ne baş e, bandora xerab çêdike.

**Hunera kurd di çi dereceyê de ye?**

baş nîzanim ku ev îdeolojî ye yan na, baş jestên han her kes dizane ku dansên gelên rojhilatî ne û ji ajalên hatine wergirtin. Ji balinde û ajalên din hatine wergirtin. Pandomîma Ewropiyan cuda ye, filozofîk diaxivin.

**Tu mamosteyê muzîkê yî jî. Gelek îdia hene ku stranên tirkî stranên yewnani bûne, wergerandine tirkî û li ser he-man rîtmê strîne, rast e?**

□ Belê. Ew gelên ku dijminên hev bin jî, ku bi salan jiyaneke wan a tevîhev



Karalîs Lakîs ligel şanoyê li ser mûzîkê jî dixebite.

hebe, ji hev û din hin tiştan werdigirin.

**Par şîrketeke li Lawrionê filmeke "Zanîsta Nîgaşî" (Bilim kurgu) di film de motîvên kurdî û kurdan wekî figûran bi kar anîn. Planeke we ya wiha heye? Yan jî li ser mijara kurdan ku ji neçariya cengê li Kurdistanê pêl bi pêl koçî Ewropa dikin, planên we hene ku hûn bikin babeta (mijar) şanoyê?**

□ Bi koma min a Lawrion ne mînkûn e. Ji ber ku endamên vê koma min giş xwendekar in zêde ne profesyonel in. Li vir em yewnaniya kevn a komedî diafirînin. Em û hinek hunermendên Ewropî, endamên "Paty Mua" hewl didin ku bi muzîka "Hoedot" bilîzin. Wekî din kabareyên me, yewnaniyan nû diaxivine ya kevn em jî nîzanim.

**Çi polîtîkaya Yewnaniyan li hemberî kurdên penaber ên li Yewnaniyanê heye?**

□ Ez zêde polîtîka naşopînim, bes ne Yewnaniyan, hemû Ewropî hema bêje ji bo kurdan tiştêkî nakin.